Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ | SAL: 1 HEJMAR: 32 | 25 PÛŞPER 1995 | BUHA: 40.000 TL(KDVD)



JI BO RAWESTANDINA ZILMA DEWLETÊ Û ÇARESERIYA SIYASÎ

LI BONNÊ 200 HEZAR KURD MEŞIYAN

ÇARESERIYA SIYASÎ

● Li paytexta Almanyayê Bonnê, heftiya borî di 17'ê pûşperê (hezîran) de nêzîkî 200 hezar kes, ji bo "Li Kurdistanê Çareseriya Siyasî" meşiyan. Ev meşa mezin, ji aliyê Partiya Alman Yekîtiya/90 ya Keskan ve hatibû sazkirin.

ÇI JI DESTÊ KÊ TÊ, BILA BIKE

● Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan ji kesên ku beşdarî meşê bûbûn re, mesajek şand. Mesaja Öcalan ya ku ji dengê wî hate dan, pir bal kişand ser xwe. Di mesajê de ev dihat gotin: "Çi ji destê kê tê, bila bike."

Rûpel 2



Bi Berpirsiyarê Giştî yê Kovara Nûbiharê Sabah Kara re sohbeteke pirreng

'Divê rewşenbîr bi berçavkên reş û spî li cîhanê nenêrin'

● Zimanê ku nêzîkî hev in, an jî di eynî malbatê de ne, karin alikariya hevûdin bikin. Zimanê farisî ji ber ku zimanê dewletî ye pir hatiye xebitandin û lê xwedî hatiye derketin, çandeke fireh bi vî zimanî hatiye pêk anîn. Ez jî dixwazim ji vê çavkaniya berfireh îstîfade bikim. Ji ber ku farisî nêzîkî zimanê kurdî ye, ez li ser wî zimanî pir disekinim.

● Zikê çandê pir fireh e, bi zebeşekê ew têr nabe; nan divê , penîr divê, goşt divê, gelek tiştên din divê, ji ber ku texesus di nav kurdan de bi pêş ve neçûye. Em hem şaîrtiyê, hem mutercîmiyê, hem siyasetvaniyê, hem jî hin tiştên din dikin. Çunku qedera kurdan ev e. Qedera gelek gelên bindest jî ev e.

Rûpel 8–9

Alo rojbaş, burası...

Cara ewil, zimanê mêran xera bû. Lê jinên kurd, ji ber ku têkiliya wan bi saziyên dewletê yên resmî re tunebû, ji bo parastina zimanê kurdî bûn garantiyek. Piştî demekê ronakbîrên kurd jî zimanê xwe ji bîr kirin. Êdî dewrek nû dest pê kiribû. Bi tirkî peyivîn, fikirîn û nivîsîn, wekî destpêka cixare kişandinê bûbû moda.

Rûpel 11

Rojnameyeke hevçerx: Welat

Di havîna 1993'yan de li Hewlêrê Welat dest bi weşana xwe kiriye û heta îro digel derxistina bêhtir ji 70 hêjmarî, berdewam e li ser weşana xwe. Welat ji 12 rûpelên 34x47 pêk hatiye û ji heftiyê carekê bi du zaravên kurdî (soranî–behdînanî) 8 rûpel û 4 rûpel jî bi zimanê erebî der diçe.

Rûpel 16

Me bêriya welatê xwe kiriye

Em bimirîn jî, em nabin cerdevan û bênamûs. Em ne ji bo xweşî û çavreşiya Edeneyê hatine vê derê. Em serbilind û serfiraz in, ji ber ku em neketine xwîna birayên xwe. Em bizanibin emê ji birçîna bimirin jî, em nabin cerdevan. Lê hêviya me jî ne dûr e.

Rûpel 7

Divê em armanca Xanî baş bizanin

Li pêş vê ronahiyê, divêt em armanca Ehmedê Xanî çak bizanibin. Ew berevanê yekgirtina me ya neteweyî bû. Nîgaşên wî (yên berî 300 salî) îro bi cih dibin. Xebata me ya ji bo demokrasî û yekgirtina neteweyî, bi bîranîn û armanca Ehmedê Xanî ve girêdayî ye.

Rûpel 12

Hindik ma, ezê jî werim cem we

Gundê Rodî li hêla Botan, li pişta çiyayên Gabarê ye. Hingê ku bavê wî çûye şerê azadiyê, ew bi qasî mirovekî mezin kar û bar dike. Ji xwişk û birayê xwe yê biçûk re bûye wekî bav. Werzên havînê li dû palan tapol dike, giha dikişîne ser lodan.

Rûpel 14

www.arsiv.org

JI BO RAWESTANDINA ZILMA DEWLETÊ Û ÇARESERIYA SIYASÎ:

LI BONNÊ 200 HEZAR KURD MEŞIYAN

Li paytexta Almanyayê Bonnê, di 17'ê pûşperê (hezîran) de nêzîkî 200 hezar kes, ji bo "Li Kurdistanê Çareseriya Siyasî" meşiyan. Ev meşa mezin, ji aliyê Partiya Alman Yekîtiya/90 ya Keskan ve hatibû sazkirin.

Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan ji kesên ku beşdarî meşê bûbûn re, mesajek şand. Mesaja Öcalan ya ku ji dengê wî hate dan, pir bal kişand ser xwe. Di mesajê de ev dihat gotin: "Çi ji destê kê tê, bila bike."

Li paytexta Almanyayê Bonnê, di 17'ê pûşperê (hezîran) de nêzîkî 200 hezar kes, ji bo "Li Kurdistanê Çareseriya Siyasî" meşiyan. Ev meşa mezin, ji aliyê Partiya Alman Yekîtiya/90 ya Keskan ve hatibû sazkirin.

Kurdên ku li dewletên Ewrûpa rûdinin, berî meşê bi rojekê ketin riyan, ji bo beşrdariya meşa mezin. Polîsên alman li gelek deverî, bi mebesta lêgerînê xwestin beşdariya kurdan kêm bikin û li deriyên hidûd, astengî derxistin pêş kurdên ku ji dewletên Ewrûpa yên din hatibûn.

Meşa herî mezin

Kurdên ku beşdarî meşê bûn, li Sudfriedhefê bi navê milê kesk, komek mezin a meşê çêkirin û ber bi meydana Hofgotenê ve meşiyan. Di vî milî de kurdên ku ji Frensa, Belçîka û ji deverên Almanyayê yên din hatibûn, beşdarî meşê bûn. Di pêşiya vî milî de posterekî Abdullah Öcalan ê mezin, alên ARGK'ê û ERNK'ê komên folklorê û sporê bi libasên xwe yên taybet, hebûn. Li pankata ku li pêşiya kortejê bû îbareyeke wiha hebû. "Li Kurdistanê Çareseriya Siyasî."

Li Rheinauparkê jî milê zer, bi beşdariya kurdên Swisrê, Avusturyayê, bajarê Almanya Staltgurt, Nürnberg, Mim, Offenbach, Freiburg û Karlsruhê hereketî meydana mezin dikir.

Di vê korteje de tişte ku bal dikişand ser xwe, xortên ku bi tîşortên Abdullah Öcalan ketibûn meşê bûn. Di vî milî de 60 hezar kurd bi libasên neteweyî û alên ERNK'ê dimeşiyan.

Ji hêla din li Josefshöheyê zêdeyî 50 hezar kes, di milê sor de beşdarî meşê bûbû. Di vî milî de kurdên Îngilîstanê, Hollandayê û Îskandinavyayê hebûn. Ji bilî kurdan, partiyên çepagirên tirk TDP, MLKP–K, partiyên çepgirên alman û PDS'ê cih digirtin. Di vî milî de Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê (YRWK) jî, rewşen bîrên ku di tarîxa Kurdistanê de di doza welatparêziyê de xwe feda kirine, fotografên wan li ser pankartekê xistibûn û di pêşiya kortejê de hilgirtibûn.

Di vê kortejê de li gel def û zirnê, bi hezaran alên ARGK'û ERNK'ê û pankartên bi slonganên cur bi cur dixuyan. Hin ji slogan û afîşan ev bûn: "An serkeftin serkeftin, Bijî Serok APO, Bijî Kurdistan, Di riya şehîdan de em ber bi îktîdarê ve dimeşin, PKK hêviya me ye."

Di meşê de yekîtiya antî–faşîst a alman (BAO), Suryanî, KKP (Partiya komunîstên Kurdistan) û TAJK'ê cih digirt.

Saet di 13.00 de li meydana Hofgartenê, ji bo çapemeniyê çadirek hate vegirtin û li wir civîna çapemeniyê hate çêkirin. Di civîna ku ji aliyê gelek rojnamevan û ekîbên tv'yan ve dihat teqîbkirin de ji Komîteya Tertîbkirina Meşê, Siegfied Martsch (Mebûsa Partiya Keskan, ji herêma Ren Westfalya Bakur), Alî Gazî (Lawê Kadî Muhammed, Serokkomarê Komara Mehabadê) Kambiz Behbahani (Endamê Rêveberiya Lijneya Navenda Keskan), Kerîm Yıldız (Serokê Projeya Mafên Mirov li Kurdistanê) Poul Morgan (Nûnerê Dêra Katolîkan li Îngilîstanê), Jon Rud (Serokê Konseya Kurd a Noveçê), Melik Fırat (Mebûsê Serbixwe li Tirkiyeyê), Zubeyir Aydar (Serokê Konseya Kargeriya Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt) û Nûnerê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê beşdar bûn.

Di civîna çapemeniyê de mebûsa Partiya Keskan Siegfried Martsch, axivî. Di axaftina xwe de Martsch qala şerê ku li Kurdistanê diqawime kir û bal kişand ser rola Almanya û Amerikayê. Li gorî gotina Martsch, Komara Tirkiyeyê, bi alîkariya van her du dewletên mezin, şer didomîne. Mantsch bi kurtî ev got: "Divê mafên gelê kurd ên siyasî, kulturî û sosyal bên qebûlkirin. Aliyê kurdan her gav diyar kiriye ku ew çareseriya siyasî dixwazin û bi gelek bangan ev hizrên xwe anîne zimên, lê gelê kurd, nikare wekî pez



Mesaja Abdullah Öcalan di dema meşê de hate xwendin.



Meşên mezin ên ku kurd li Ewrûpayê pêk tînin tesîreke mezin li civaka ewrûpî jî dikin.

Öcalan bû. Öcalan di destpêka mesaja xwe de digot, "Ji beşdarên meşa mezin a azadiya Kurdistanê re" û dû re jî bangî gelê kurd, tirk û alman kir. Öcalan rexne li siyaseta Almanya girt û got ku ew ji wan alîkariyê naxwazin, bes bila alîkariyê nedin şerê kirêt. Di mesaja Öcalan a ku bi kasetê û ji dengê wî dihat guhdarikirin de ev dihat gotin: "Komara Tirkiyeyê, dîsa dixwaze di bin hin navan de, li hemberî gelê me qirkirinên nû çêbike. Em jî li hemberî van kirinan bi hemû hêza xwe, disekinin. Di wexteke wiha de gelê me û dostên me yên li Ewrûpayê, bi mebesta çareserkirina siyasî ya li dijî şerê kirêt meşek wiha li dar xistine; ez bawer im wê di riya çareserkirina vê meseleyê de, ev hewldan bibe merheleyekê nû. Ez di vî karî we de serkeftinê dixwazim û silavan li we dikim."

Çi ji destê kê bê bila bike

Serokê PKK'ê Öcalan, li ser encama şer jî sekinî û got ku tesîra nebaş yên vî şerî, bêtir li gelê tirk dibe û êdî rayedarên tirk nikarin wekî berê raya giştî ya dinyayê bixapînin û wê ev şer wan bifetisîne. Öcalan, di dewama mesajê de, bangî gelê kurd kir û diyar kir ku kurd ketine nav şerê man û nemanê. Li ser vê meseleyê Öcalan wiha got: "Bila hûn zanibin, em di merheleyeke wisa de ne ku êdî dewleta dagirker nikare tiştê ku anîbûn serê gelê ermen û rûm, bîne serê gelê kurd. Me rê li ber van îhtimalan girtiye, em rê nadin wan. Ji bo vê yekê, li febrîkayan, malan, zeviyan ku hewce be bi duayekê, li hemberî qirkirinan bi xebateke rêxistî derkevin û tewra şoreşgerî nîşan bidin. Bi gotineke din, çi ji destê kê tê, divê bike."

BONN / Welatê Me

JÛJÎ

Doğan Güzel



Cejna 'Newrozê' dibe tatîla resmî

Komîsyona Hiquqê ya Parlementoya Kurdistanê ya Li Derveyî Welêt (PKD) 21'ê adarê Cejna Newrozê kir tatîla resmî. Komisyona Hiqûqê, pêşniyaza vê yekê di civîna xwe ya yekemîn de qebûl kir û wê di civîna parlementoyê ya yekemîn de bîne rojevê.

Komîsyona Hiqûqê ya PKD'ê li gorî peyrewa navxweyî (nîzamnameya hûndirîn) civîna xwe ya yekemîn li Hamburga Almanyayê çêkir û li ser pêşniyazên cur bi cur sekinî. Di civînê de emdaman piştî xwendina raporên xwe li ser pêşniyaza "Pîrozkirina Cejna Neteweyî" munaqeşe kirin. Li gorî amadekirina pêşniyazê, ji îsal pê ve her sal, saet ji 7.00'ê 20'ê adarê heta saet 24.00'ê 21'ê adarê wê li Kurdistanê tatîla resmî be.

Li ser mijarê Berdevkê Komîsyonê Av. Serhat Bucak got: "Di van rojan de hemû dikan, cihên kar û dibistan li welat û derveyî welat wê werin girtin. Kurdên ku li Ewrûpayê dijîn jî, wê tatîlê bikin û cihên kar û dikanên xwe venekin û zarokên xwe neşînin dibistanan."

Bucak di dewama axaftina xwe de jî got ku ewê di xebatên xwe de pêşî ji bo "Qanûna Bingehîn û Qanûna Bacê" xebatan bikin û ji bo amadekirina "Hiqûqa Neteweyî" jî komîsyonan ava bikin.



Av.Serhat Bucak

Navenda Nûçeyan

Li Tirkiyeyê êdî karmend jî bi awayekî girseyî li mafê xwe digerin

100 hezar karmendî Enqere hejandin

Karmend ji 15'ê pûşperê bi vir ve her diçe livbaziyên xwe gurtir dikin. Karmendan livbaziya xwe ya herî mezin li Enqereyê roja 17'ê pûşperê li dar xistin.

Ev demek e li Tirkiyeyê xebatkarên cemawerî (kamu) ji bo mafên xwe yên "Grev û peymana giştî" livbaziyên xwe didomînin. Karmend ji 15'ê pûşperê bi vir ve her diçe livbaziyên xwe gurtir dikin. Karmendan livbaziya xwe ya herî mezin li Enqereyê roja 17'ê pûşperê li dar xistin. Di xwepêşdana karmendan de nêzîkî 100 hezar karmendî cih girtin û hikûmet protesto kirin.

Karmendên Enqereyê, di saet 10.00 de, li pêşiya Sûka Zaferê û karmendên ji bajêrên cur bi cur hatine jî li Hîpodromê civiyan. Karmendan saet li nêzîkî 10.30'an, ber bi aliyê Meydana Kızılay ve dest bi meşê kirin. Saet nêzîkî 12.00'an li Meydana Kızılayê nêzîkî 100 hezar karmendî civiyan û hikûmet protesto kirin. Di xwepêşdanê de karmendan sloganên wekî" Bêdeng nemînin wê dor were we jî, Me sendikaya dibin kontrola dewletê de navê, Em ji pêkutiyan natirsin" û hwd. avêtin û pankarta "Qanûna Bingehîn a demokratîk û mafên grev û peymana giştî" vekirin.



Karmenda bi rojan meydana Kızılayê îşgal kirin.

Piştî xwepêşdanê, gelek sendîkavan û karmend ji aliyê polîsan ve hatin binçavkirin. Karmendan piştî xwepêşdana Enqereyê li Stenbol, İzmir, Edene û hwd. jî livbaziyên cur bi cur çêkirin.

Navenda Nûçeyan

...KURTENÛÇE...

Ji Alewiyên Kurdistanê "Roja Aşûreyê"

Yekîtiya Elewiyên Kurdistanê, di 15'ê pûşperê de li Stutgarta Almanyayê "Roja Aşûreyê" çêkir. Di rojê de zêdeyî 500 kesî cih girtin û li ser navê yekîtiyê jî Hasan Kutlu axaftinek kir û got; "Alewî li hemberî zilmê nikarin bêteref bimînin. Agirê li Kerbelayê hatiye pêxistin îro li çiyayên Kurdistanê û di tifikên Kurdistanê de her diçe gurtir dibe."

Afrîkaya Başûr Tirkiyeyê dixe binçav

Komara Afrikaya Başûr, îhlalên mafên mirovan yên ku li Tirkiyeyê çêdibin, ji nêzîk ve takîp dike. Balyozê Afrikaya Başûr Cornelius François Jacop li ser mijarê bi Serokê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan Akın Birdal re hevdîtinek kir û jê agahî standin. Wekî ku tê zanîn beriya demekê Afrikaya Başûr ji bo firotina sîlehan ambargo danîbû ser Tirkiyeyê.

Polîs êrîşî antenên peykê dikin

Polîs ji bo ku li TV-MED'ê neyê temaşekirin, her roj êrîşî mal û qehwexaneyan dikin. Piştî Amedê, polîsên Edeneyê jî li taxên Gülbahçesî, Karasu û Dağlıoğluyê êrîşî 5 malên ku antena wan a peykê heye, kirin. Di van malan de 50 kesên ku li televîzyon temaşe dikirin, ji aliyê emniyeta Edeneyê ve hatin binçavkirin û anten jî hatin şikandin.

Avakirina gundên stratejîk didome

Li dora Elkê (Beytüşşebab) xebatên dewletê ji bo gundên stratejîk dewam dike. Ji bo vê yekê eşîra Mamxura li dora gundên Mezra û Kulîtan, eşîra Gevdan jî li gundê Faraşîn tên bicihkirin. Li gorî agahiyên ku gihîştin destê me, li dora van gundan xebata avahiyên Tabura jî dest pê kiriye. Ev xebat li dora Xawesorê (Gürpınar) jî didome.

Îslam û pirsgirêka Kurdistanê

Hefteya borî li paytexta Norvec li Osloyê, semînerek bi navê "Îslam û pirsgirêka Kurdistanê" li dar ket. Di semînerê de Serokê Hareketa Îslamî ya Kurdistanê û parlementerê PKD'ê Abdurahman Dürre axaftinek kir û got ku îro li Kurdistanê zilm û hovîtiyeke bêhempa heye û divê hemû misilman li dijî vê zilmê derkevin.

Navê **5** kesên ku di xaçepirsa hejmara 30'an de peyva veşarî **'Axîna Welat'** dîtine û kaseta **"Dûrî"** ya Ciwan Haco qezenc kirine:

Atila Öztürk
Semsûr

İbrahim Alp
Mêrdîn

Sultan Sarı
Çanakkale

Siyabend Tekoşer
Mêrsîn

Rojin Çekdar
Mûş

Helsinki Watch: "Tirkiye peymanên navneteweyî îhlal dike"



Komîteya Çavdêriya Mafên Mirovan ya Helsînkiyê (Helsînkî Watch) xebatên xwe yên li Tirkiyeyê sekinandin. Li ser vê mijarê Midurê Giştî Holly Cartner daxuyand ku wan li ser axaftina Wezîrê Karê Hundîrîn yê Tirkiyeyê Nahit Menteş, ev biryar standiye. Wekî ku tê zanîn Menteşe bi nûnerê saziyê re hevdîtinek kiribû û di wê hevdîtinê de gotûbû ku ev sazî, siyaseta wan diecibîne.

Hefteya borî Nûnerê Helsînkî Watchê Christopher Ponico, ji bo lêkolina mafên mirovan hatibû Tirkiyeyê. Di hevdîtina Ponico û Menteşe de, wezîr daxuyandibû ku komîte terefdarê hikûmetê ye. Di civînê de Ponico jî gotibû ku ev yek ne rast e û dû re jî dev ji lêkolînê berdabû.

Li ser mijarê Midurê Giştî yê Helsinki Watchê Cartner, di 16'ê pûşperê de daxuyaniyek da û got, "Em saziyeke serbixwe ne. Lê wezirê Tirkiyeyê xwest ku me wekî alîyekî şer, nîşan bide. Di rewşeke wiha de em nikarin xebatên xwe bidomînin. Ji ber van şertan, ji bo demekê em xebatên xwe yên li Tirkiyeyê disekinînin." Nûner di dewama axaftina xwe de jî wiha got, "PKK'ê, Konvansiyona Cenevreyê qebûl kiriye. Me dixwest ku em hem îhlalên mafên mirovan yên li Tirkiyeyê bibînin û hem jî binêrin bê ka PKK, şerê xwe li gorî madeyên Konvansiyona Cenevreyê dike an na."

Sekreterê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan Hüsnü Öndül jî li ser mijarê daxuyaniyek da û got, "Em bi biryara Helsinki Watchê memnûn bûn. Divê ev biryar ji hemû 'saziyên ku derveyî hikûmeta - ne (NGO) re bibe mînak. Ji ber ku Tirkiye hemû peymanên navneteweyî bi awayekî eşkere îhlal dike."

Navenda Nûçeyan

Li Erzeromê grev didome

Malbatên girtiyên Girtîgeha Erzeromê daxuyaniyek dan û gotin ku pêkûtî û cerdên li ser girtiyan pîştî peymanê jî nesekinîne. Li ser vê yekê jî 70 girtî li dijî van zordariyan dest bi greva birçîbûnê kirine. Piştî daxuyaniyê Komeleya Mafên Mirovan (İHD) ji Weziriya Dadê re nameyek şand û sekinandina cerd û êrîşên li ser girtiyan xwest.

Li gorî agahiyên ku lêzimên girtiyan dan, êrîş û zilma li ser girtiyan nesekiniye, wan dîsa dest bi greva birçîbûnê kiriye. Di axaftina lêziman de ev tê gotin: Piştî peymanê, zarokên me ji rayedaran xwestine ku ew sozê xwe bînin cih. Lê rayedaran ferman dane leşker û gardiyanan ku ew êrîşê bibin ser zarokên me. Li ser van kirinan jî zarokên me dîsa dest bi greva birçîbûnê kirine.

Komeleya Mafên Mirovan ya Stenbolê ji Wezîriya Dadê re nameyek şand û ji wezîriyê xwest ku mudaxeleyî pêkutiyên li girtyan bike.

Navenda Nûçeyan

Polîs avêt ser İHD'ya Meletê

Li gelek deveran kampanyayên "Windakirinên di bin çav de bila biqedin" didomin. KMM'ya Meletê jî ji bo piştgiriya vê kampanyayê, xwest ku roja 16'ê pûşperê civîneke çapemeniyê çêbike. Lê beriya civîna çapemeniyê, polîsan avêt ser Şubeya Komeleya Mafên Mirovan ya Meletê û qeyda nasnameyên kesên ku li komeleyên bûn, girtin. Piştî ku polîs ji komeleyê çûn, Serokê Şûbeyê Hasan Buran daxuyaniyek da û got, "Bîranîna kesên windakirî jî, rayedarên me ditirsîne. Ev yek jî nîşan dide ku wê rayedar der heqê qatilên kesên winda de tu tiştî nekin."

Navenda Nûçeyan

XAÇEPIRSA BIXELAT (30)



PEYVA VEŞARÎ → AXÎN AWEL A 30

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi riya pişkê (kura) li 5 kesan tên belavkirin. Xelata hejmara 32'an; pirtûka **Cengiz Aytmatov "Evîna Cemîlê"** ye. Ev pirtûk ji aliyê Weşanxaneya Fıratê ve hatiye çapkirin

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

Xelata Xaçepirsê



"Evîna Cemîlê"
Cengiz Aytmatov

XAÇEPIRSA BIXELAT (32)



PEYVA VEŞARÎ →

1 2 3 4 5 6 7 8

Li Şîliyê berpirsên şerê kirêt derdikevin holê

Roja 20'ê pûşperê polîsan ji bo girtina albayekî ku wekî kujyarê (qatilê) wezîrê Karê Derve yê hikûmeta Salvador Allende Orlando Letelier hatibû cezakirin, avêtin ser lojmanên leşkeran. Wan li wir Albay Pedro Espinozayê ku tevî General Manuel Lontreras wekî berpirsê kuştina Orlando Letelier hatibû cezakirin, girtin. Wezîrê Karê Derve yê hikûmeta sosyalîst Orlando Letelier, piştî cuntaya 1973'yan derketibû derveyî welêt û di 1976'an de li Washingtonê bi destê kujyarên cuntayê hatibû kuştin.

Zedillo: Meseleyên zapatîstan bi çekan hal nabe

Serokê Meksîkayê da zanîn ku şerê bi EZLN'ê re bi riya leşkerî çareser nabe. Ernesto Zedillo bi kanala Telnoticiasê re hevpeyvînek kir. Zedillo di vê hevpeyvîna ku roja 20'ê pûşperê hate weşandin de wiha got: "Çareseyeke zû ku bi çekan pêk were, nîn e. Ew kesên ku qala van tiştan dikin nizanin çi dibêjin." Wî got ku ew li aliyekî hevpeyvînan didomînin, li aliyê din jî hewl didin ku problemên civakî ji holê rakin.

Li Arjantînê hekîm jî tevî şerê kirêt bûne

Li gorî agahiyên ku ajansa DyN'ê ji Buenos Airesê daxuyand, hinek bijîşkan di dema cuntayê de zarokên dîlên li kampan, firotine kesên din. Adriana Calvo de Labourdeyê ji ber vê yekê, li dijî bijîşkê polîsî yê berê Dr. Jorge Berges doz vekir. Labourdeyê da zanîn ku bijîşkan di dema kontrola berî zayînê de hinek zarok niqandine û ew piştî zayînê bi belgeyên sexte firotine hin kesên din. Wê ji ajansê re got ku Dr. Jorge Berges zarokê wê bi vî awayî firotiye.

Nûçeyên Derve

Nivîskarê nîjerî, xelatgirê Nobela sala 1986'an:

Îngiliz ji Abacha re dibêjin pêxwas lê ew bi xwe çekan difiroşinê



Sani Abacha



Wole Soyinka

Nivîskarê nîjerî Wole Soyinka wekî xelatgirê Nobela sala 1986'an û parêzkarê mafê mirovan li dijî cuntaya Sani Abacha navûdeng daye. Soyinka pêşî bi şano, helbest, gotar û romanên biyografîk ên ji tevherikîna çandeya Yorubayî û çandeya îngilizên kolonyalîst pêkhatî, bal kişand ser xwe. Ew berî 7 mehan derketiye derveyî welat. Kovara Newsweekê di hejmara xwe ya 26'ê pûşperê de cih da hevpeyvîneke bi Soyinka re. Em vê hevpeyvînê werdigerînin zimanê kurdî û pêşkêşî we dikin.

Gelo bi awayekî resmî hûn mişextî ne?

–Ez xwe wekî mişextiyekî nabînim. Ji ber ku ez dikarim bi eynî riya ku ji welêt derketime, careke din vegerim. Hin mirovên din ku di nava tevgera demokrasîxwaz de cih digirin jî, her tim wisa dikin. Ez berî 7 mehan ji welêt derketim, bi qasî heftiyekê haya wan jê çênebû.

Ev tişt ji bo têrênekirina hikûmetê wisa bû, an ew zêde li ser we nasekinin?

– Heke qasî ji min bê, ez objektîf bim, ez bawer dikim hikûmet zehftirîn li ser sê kesan disekine, rika xwe li wan girêdaye. Ez jî yek ji wan im. Ji wan sê kesan yê duyemîn Moshood Abiola ye ku di hilbijartina 1993'yan de wekî serok hate hilbijartin û niha di girtîgehê de ye. Kesê sêyemîn Shehu Yar'Aduayê ku di rêveberiya leşkerî ya berî vê de fermandarê duyemîn bû û ew jî niha girtî ye. Têrênekirina hikûmetê ewqas zehf e ku piştî derketina min bi rojan çavdêriya mala min kirin û erebeya min şopandin. Heta ez gihîştim Fransayê min daxuyaniyek neda, ji ber ku min nexwest bi dewletên ku ez di nav re derbas dibim re jî lihevkirinan çêbikim. Dema bi çûna min hesiyan, bi rastî har û dîn bûn. Gelek mirovên ku tu eleqeya wan bi revîna min tunebû girtin binçav û ew dan ber pirsan. Wan nedixwestin baweriya xwe bi vê yekê bînin, ji ber ku ev tişt nîşana balebûna wan e. Divê bizanibin ku ew nikarin hemû Nîjeryayê kontrol bikin.

We ji welatên rojavayî xwest ku rexneyên xwe yên li rejîma Abacha gur bikin, wan çi bertek (reaksiyon) nîşan da?

–Welatên rojavayî pir bi endîşe ne, li layê berjewendiyên wan e jî ku ew dest biavêjin hinek çalakiyan. Ambargoya qismî ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê pêşkêş kir, têrê nake. Lê ez daxwaza gel ji bo gaveke pêşketîtir dibînim. Fransa hinek karên xwe bincil dike. Welatên skandînavî ji rewşê aciz in, lê nizanin wê çi reaksiyonê nîşan bidin. Îngiliz bi dîtina min ji dest çûne. Ew naxwazin ku rastiya meseleyê fêm bikin. Ew rastî hilbijartina 12'yê pûşpera 1995'an e. Bi vê hilbijartinê serokek hilbijartî derket holê ku niha li pişt deriyê hesinî ye. Belê em qala hilbijartina herî paqij û dadyar ku serokek derxist holê, dikin. Ew hilbijartin ji aliyê dîktatorekî ve hate rawestandin. Hikûmeta îngiliz heta meha adarê jî tank difirotin wî dîktatorî.

Lê hikûmetên afrîkayê?

–Welatên afrîkî, bêawarte dilê wan li hemberî rewşa Nîjeryayê li hev dikeve. Tiştekî em dixwazin bi wan bidin kirin ev e ku dîtinên xwe eşkere bikin. Roja ku Mandela bi awayekî vekirî tewra xwe ya li hemberî hikûmeta nîjerî diyar kir, wê di helwesta ewrûpiyan de jî guherîneke berbiçav çêbe.

Çi sedem rê nade ku Mandela vê yekê bike?

–Mandela bawermendekî sereke yê lihevanînê ye, baweriya wî bi dîplomasiyeke bêdeng heye. Sedema helwesta Afrîkaya Başûr a heta vêga ev e. Lê ez bawer im êdî zêde rê li ber Mandela nemane, ji bilî lanetkirina vê rejîmê. Ev tişt wê raya dinyayê dagerîne dijî rejîma Abacha. Heke vê yekê bike, dibe ku karibe rê li ber şerê hundirîn jî bigire.

Rika we ya li hemberî Îngilistanê ji ber mîrasa wê ya kolonyalîst a li rojavayê Afrîkayê ye gelo?

–Tevî ku ez di pirsgirêka Nîjeryayê de sûcê mezin li nebûna ramanyar û serokan bar dikim jî, ev nexweşî fêkiyên darên jahrîn ên ku Îngilistanê li ser erdê me çandibûn in. Divê ev dewlet ji gelek aliyî ve lêborîna xwe ji me bixwaze. Lê ew berevajî vî tiştî, bi polîtîkayên ku dimeşîne, dixwaze rewşeke ku bixwe tu car qebûl nake, bi me bide pejirandin. Gelo wê Major an jî Thatcher bixwaze ku kujerekî wekî Abacha welatê wan bi rê ve bibe? Ew li aliyekî Abacha wekî pêxwas bi nav dikin, li aliyê din tankan difiroşinê. Rast e, Abacha bale ye, lê baleyekî kujyar e. Îngilistan jî vê yekê dizane, lê dîsa jî wî wekî mirovekî hêjayî danûstandinê dibîne.

Gelo çareserkirina pirsgirêkan, berpirsiyariya Îngilistanê ye?

–Na. Ez vê yekê napejirînim. Nîjerya welatekî serbixwe ye. Her wiha ez helwesta Fransayê rexne dikim. Ew tankan nafiroşe Abacha, lê tiştekî jî nake li dijî wî. Dema serhildana pûşpera 1993'yan ez jî di nav girseyê gel de bûm. Min dît Abacha tevî leşkerên xwe hat, ferman da zilamên xwe ku, girse gulebaran bikin. Di gulebaranê de zêdetirîn 200 kesî hate kuştin. Ez baş dizanim ji ber ku min alîkariya berhevkirina cendekan kir. Îngiliz vî zilamî baş nas dikin, lê hê jî çekan difiroşin wî.



Bicihkirina hêzên amerîkî, li xaka Bosnayê

FAL



BERAN (21 Adar – 20 Avrêl)

Dema dilê we tiştek xwest, divê di cih de pêk were. Heke derdekî we hebe, hûn qet li rewşa mirovên din nafikirin, hûn wan ji xewa hingor hişyar dikin. Gotina: "Beq nequre, wê bidire" bi rastî vê rewşa baş tîne zimên. Jiyana bi vî awayî hew dimeşe.



GA (21 Avrêl – 21 Gulan)

Hûn jî dizanin ku vexwarina alkolê li we nayê. Dema hûn bîrayekê jî vedixwin, hûn ditevizin. Hûn dibêjin: "Heke ez venexwim, ezê nexweş bikevim." Kalikên me gotine: "Ta ji mirinê çêtir e." hinekî zehmetiyê bikişînin.



CÊWÎ (22 Gulan – 21 Pûşper)

Hûn xwe li her karî girêdidin, lê tu karî nagihînin encamê. Ev helwesta we baweriya hevalan dişikêne. Hinekî bêhnfireh û biaram bin ku ji we re nebêjin: "Gayê qelb nîr dişikêne." Bala xwe bidin mirovên din, ka ew çawa dixebitin.



KEVJAL (22 Pûşper – 23 Tirmeh)

Ev guherîna we ya li rû, dilê mirovan şa nake. Ew ji we guherîneke rihvedayî hêvî dikin. Nebêjin: "Ahê destê rastê ji yê çepê re namîne." Divê mirov ahê xwe ji tu kesî re nehêle. We çend roj westgirtin (bêhndan) divê.



ŞÊR (24 Tirmeh – 23 Gelawêj)

Dema yek tiştekî cihêreng dibêje, hûn tavilê ji ber dikin. Mixabin xisletê we yê nivîsandinê bi pêş neketiye. Rast e pêşiyên me gotine: "Xebatê ji min re bike, ji xwe re hîn bibe." Lê ji bo agahiyeke biçûk ji xelkê re koletiyê nekin.



SIMBIL (24 Gelawêj – 23 Rezber)

Hûn li rojên pêş, bi taybetî jî li pîrbûnê pir difikirin. Tevdîra ku hûn ji bo wan rojan dikin, roja ku hûn tê de ne, dixe xetereyê. Ji bîr nekin: "Toraqa îro, ji rûnê sibe çêtir e." Ji bo wan rojan, ciwaniya xwe neherimînin.



MÊZÎN (24 Rezber – 23 Kewçêr)

Hûn bi hêsanî nikarin li ser tiştekî biryarê bidin. Hin kes ji ber vê yekê kenê xwe bi we dikin. Hema di cih de qerara xwe bidin û biçin wan kesan bi zimanekî tûj rexne bikin. Biryarên xwe zû bidin ku xelk nebêje: "Xwedê goşt dide teyrê bêdiran."



DÛPIŞK (24 Kewçêr – 22 Sermawez)

Hin kesên pexîl li hemberî we çavnebariyan dikin. Hinek taybetiyên we wan dihesidînin, rika wan dikişînin ser we. Rast e, "Zikreşî li xwediyê xwe vedigere" Lê ew kes di warê çalkolanê de gelek jîr in. Ji ber vê yekê divê hûn hay ji xwe hebin.



KEVAN (23 Sermawez – 21 Berfanbar)

Hûn hez ji hevalên xwe dikin, lê qet tehamûla we li hemberî qiseyên qor û henekên nelirê tune ye. Li gorî felsefeya we, "Heke şerm tunebe, hurmet jî tune ye." Lê hin caran hûn jî guh nadin van qeyide û rêzikan.



KARIK (22 Berfanbar – 20 Rêbendan)

We di zaroktiya xwe de ji nexweşiyan gelek kişand. Niha tevî ku tu nexweşiya we tune ye jî, hûn tim dixwazin di bin çavdêriya bijîşk re derbas bibin. Dema ku hûn janeke pir biçûk di canê xwe de hîs dikin, dibêjin: "Dema zik nebirçî be, nake qurequr."



DEWLIK (21 Rêbendan – 11 Reşemî)

Awirên we ji dûr ve bala mirovan dikişînin ser xwe. Dema mirov bi baldarî li çavên we dinêre, wekî deryayeke tijî nependî ne. Lê çalakiyên we û zimanê we nikarin wan tiştan îfade bike. Gelo bi rastî jî, ji çavên kor hêstirên zêrîn nayên?



MASÎ (20 Reşemî – 20 Adar)

Heke hûn bihirî bûna, hûnê li nav kerî bûna. Ji ber ku hûn guh nadin edet û kevneşopan, hûn tim ji civakê der in. Gelo hûnê heta kengê bi vî awayî bijîn? Li aliyê din ji bo guhartina civakê jî tu xebatên we nîn in. Wê çawa bimeşe?

Xulamê biaqil



Rojekê ji rojan, ka bi çi sedemê ye ez nizanim, çend heb axê ku hevûdu nas dikin û bi xulamê xwe ve civîneke girîng li cihekî datînin.

Şor û sohbetên xwe dikin, roj dibe nîvroj. Radibin nimêja nîvrojê dikin. Îca dibe wexta firavînê. Xwarin tê ber wan û rûdinin li ser xwarinê. Qey xwarina wan jî birinc û goşt e.

Ji xulaman yek, bala xwe dide axê xwe ku birinc li ser simbêlê wî sekinî ye. Xulam dibêje: "Axe, axe berfê li zozanan daye." Axe fêm dike û simbêlê xwe paqij dike. Axayê din bi sedema ku here avrêjê radibe û xulam jî dide dû wî. Li derve xulamê xwe şîret dike. Axe ji xulam re dibêje: "Te dît, xulamê xelkê çiqas biaqil in. De emê herin ser xwarina xwe tu jî ji min re bibêjî axe berfê li zozanan daye." Rûdinin xwarina xwe dixwin. Birinc li ser simbêlê wî jî digire.

Xulam dibêje: "Axe axe ew tiştê ku li avrêje te ji min re got, li simbêlê te girtiye."

BIŞARÊ ÇETO

Maka qumil



Berî 40–50 salî, wê gavê ji ber tunebûna dermanan qumil pir bû û xesarek mezin dida zeviyan. Bi piranî jî genim û ceh dixwar. Hikûmetê gotiye: "Serê kîloyek qumil, emê ewqas dirav bidin." Gundiyan jî qumil dane hev û birine ofîsê. Sûrgiçiyê me jî çûye çend kîs û çewal ji kûsiyan dagirtine birine ofîsê. Eksper (karmendê ofîsê) li giraniya barê gundî dinihêre ku zedê ye. Devê kîsê wî vedike ku tev kûsî ne. Dibêje: "Ev çi ne?" Gundiyê me dibêje: "Qumil e!" Eksper dibêje: "Malneketo ev çawa dibe qumil?" Li ser vê pirsê Sûrgiçiyê me dibê: "Ev maka qumil in. Qumil tev ji van çêdibin."

M. BEDRAN BÊNAV

Vurvurok

Demekê berê, li gundê Malxasa Serhedê leşkerên romê tên gund. Muxtar, navê wî bi xwe Hesen e, navê azayê wî ji Azîz bû ye. Azîz bi xwe tirkî qet nizanibû. Leşker Azîz dixwazin ku bibin nav gund û cem muxtar. Lê Azîz nizane, çi bêje. Leşker Azîz didin ber pehînan û lê dixin. Gundî direvin cem muxtar û dibêjin: "Hesen, Hesen leşker li Azîz dixin," Hesen (muxtar) radibe bi lez diçe cem wan, lê dinhêre, leşker Azîz dikutin, muxtar dibêje leşkeran: "Vur, vur, vur!" Leşker bala xwe dide muxtar jî dibêje. Ew hêjî behtir wî dikutin.

Azîzê reben tê bîra wî ku "vur" lêxistine. dibêje: "Muxtar rebena nebêje vur vur bêje yeter yeter." Tê bîra muxtar jî ku vur lêxistin e, dibêje leşkeran: "Yeter yeter" gava leşker disekinin Azîz dibêje ez qurbana yetero ku yeterok nebûya vurvurokê ez dikuştim.

SELÎM MALXAS

Ax looo!

Wextê ku havîn tê li dora Amed, Mêrdînê bi şev, ji ber germê herkes derdikeve li ser xaniyê xwe radizê.

Li gundekî Midyadê jî mirovek tevî jina xwe li ser xaniyê xwe ne. Mêrik ji jina xwe re dibêje: "Xanim ka emê îşev bi kerikî bileyîzin."

Jina wî dibêje: "Kuro kerikî ji me re ji ku derket." Lê belê ji ber mêrê xwe tu xelasiyê nake. Dibêje: "Ka emê çawa bileyîzin?"

Mêrik dibêje: "Emê xwe tazî bikin, tê birevî ezê jî bibezim ku ez te zeft bikim."

Di nav revê de jinik pêhînekê li devê mêrê xwe dixe, mêrik xwe li hewşê dibîne. Heta jinik dadikeve hewşê ku mêrik miriye jî. Di şîna wî de jinik li sînga xwe dixe û dibêje: "Ax looo! Ma min ji te re ne got ku kerikî li me nayê."

M. BEDRAN BÊNAV

Bi kurdên ku koçberî bajarê Edeneyê bûne re
li ser rewşa wan û daxwazên wan sohbetek

Me bêriya welatê xwe kiriye

Em bimirîn jî, em nabin cerdevan û bênamûs. Em ne ji bo xweşî û çavreşiya Edeneyê hatine vê derê. Em serbilind û serfiraz in ji ber ku em neketine xwîna birayên xwe. Em bizanibin emê ji birçiya bimirin jî nabin cerdevan. Lê hêviya me jî ne dûr e. Dîsa dawiya dawî welat welatê me ye, ne yê cerdevanan e. Kengê hebe, emê dagerin welatê xwe. Baweriya me bi doza me heye, baweriya me bi şehîdên me û şervanên me heye.

Li Kurdistanê şerê hov û dagirkeriyê her diçe zêde dibe. Hejmarên gundên şewitandî zêde dibin û kurd dikevin statuya penaberiyê. Belê di van demên ku em tê de ne de, neşewitandina gundan bi qebûlkirina cerdevaniyê girêdayî ye. Ji ber vê yekê dewlet ji ber ku di şerê li dijî gerîlayên ARGK'ê de bi ser nakin evû herdu piyên wê dikevin solekê berê xwe dide gundiyên belengaz, bêçek û cerdevaniyê davêje pêşiya wan.

Ji van êrîşên bêqaîde gundê Cinata (Nisêbîn) û gundê Kermêtê (Mehsertê) jî nesîbê xwe standin. Li Kermêtê 150, li Cinata jî 300 malbat ji ber ku nebûne cerdevan piştî zilm û zordarî û îşkenceyan ji gundên xwe derketine. Hêzên dewletê dîsa heywan bi saxîtî şewitandine, qûtên gundiyan tevlîhev kirine, eşyayên giranbuha şikandine, an jî şewitandine.

Ji gundê Kermêtê û Cinata nêzîkî 50 malbat hatine Edeneyê, taxên bi navê Dağlioğlu, Gülbahçesi, Karasu, Yenibey, Hürriyet, Anadolu û 19 Mayisê, piştî hatina gundiyan Heyeta HADEP'ê bi rêberiya Serokê HADEP'a Seyhanê Mustafa Karabulut çûn cem malbatên gundê Cinata û Kermêtê. Mustafa Karabulut ragihand ku ji bo alîkarî û piştgiriya gundiyan çi ji destê wan were wê bikin.

Piştî koçbûna gundiyan, em çûn taxa Hürriyetê, cem malbatekê ku ji Kermêtê hatiye û piştre jî em çûn taxa Dağlioğlu'yê cem malbatekê ku ji Cinatan koç bûne. Me xwest ku rewşa wan a berî gund valakirinê, zilma ku li wan hatiye kirin û rewşa vêga ku tê de ne hîn bibin.

Di heftiya borî de gundê Cinata û gundê Kermêtê ji hêla tîmên taybet û cerdevanên gundê Miqrê û Tinatê ve hatin şewitandin, gundî şev û rojekê li bênderê, li ser piyan dane sekinandin û ji gundiyan jî 3 kes bi navê: Rahimê Halim (15 salî), Amedê Nordîn û Hiseynê Hacî Zuberî kuştin. Ev her sê kes jî, ji gundê Kemêtê bûn û ji ber ku gund nebûbû cerdevan hatibûn kuştin. Tê zanîn ku beriya 2 mehan ji muxtarê gund Hüseyin Ayaz, ji hêla hêzên dewletê û cerdevanan ve piştî îşkenceyên giran hate kuştin. Gundê Kermêtê 150 mal in, lê belê ji ber zilm û pêkutiya dewletê û kesek di gund de nemaye. 150 malên ku koç bûne, çûne deverên mîna Amed, Dîlok, Îzmîr, Mêrsîn û Edeneyê. Em jî, ji wan malbatên ku nêzîkî 30 mal in hatine Edeneyê çûn cem mala Xaleta Heyatê. Xaleta Heyatê 55 salî ye û ji gundê Kermêtê ye. Ew, bi zilamê xwe 3 kur û bûkên xwe û neviyên xwe ve nêzîkî 20 kes hatine Edeneyê, li taxa Hürriyetê di hundirê odeyekê de dijîn. Xaleta Heyatê ji ber keserên dilan û hêstirên çavan zû bi zû bersivên pirsên me nade, lê gava mijûl dibe jî, dilê xwe rehet dike. Xaleta Heyatê wiha dibêje: "Leşker û cerdevanan tu tade nema ku bi me nekirin. Xwedê! Xwedê! Tu ji wan re nehêlî! Şev û roj jî me re nemaye." Zilamê Xaleta Heyatê Îbrahîm (Xalê Îbo) jî wiha dibêje: "Pêşî hatin zarok û zêç, pîr û kal, jin û mêr top kirin û birin.

Şev û rojekê em li ser bênderekê bênan û bêav hiştin, em tazî kirin, dest avêtin pîrekan." (Dema van gotina dibêje, girîn dikeve qirika wî) paşê jî ketin nava gund, derî û şibakên me û malên me yên giranbuha wekî cemedang (sarinc) dolab û televîzyona me şewitandin qûtên me (nîsk, genim, mişewş, savar) tevlîhev kirin." Xalê Îbrahîm diyar dike ku ev heftiyeke hatine Edeneyê û tu kar û xebat tune ku bikin. Û peyvên xwe wiha didomîne: "Em dixwazin vegerin welatê xwe. Li vî welatê xerîb hiş û aqil di mejiyê me de nemaye.

Li gund bi milyaran mal û milkên me hebûn, lê Xwedê ji xêrnexwaz û cahşikên xwînfiroş ne razî be, vêga em li vî welatî, tazî, birçî, hejar û perîşan wekî sêwiyên ber deriyan in."

Piştre em rabûn ji taxa Hürriyetê û me berê xwe da taxa Dağlioğluyê cem malbatekê ku ji ber zilm û zordariya dewletê û cerdevanan ji gundê Cinata hatiye û me hin pirs ji wan kirin.

Hûn bi kurtayî xwe dikarin ji me re bidin naskirin?

– Navê min Mihemed Orhan e. Ez 32 salî me û ji gundê Cinata me.

Rewşa we ya berî pest û kotekiyan çawa bû?

– Ez salawext li gund nedimam, ji ber ku li gund kar tunebû, debara me nedibû. Ez diçûm Qibrisê, min emeletî dikir. Li gund kar û xebat tunebû, lê belê zilm û zordarî jî tunebû. Ji ber ku berê sîstema cerdevaniyê tunebû, kêf kêfa me bû, me erdê xwe diçand, bostan û rêzên me hebûn, di nav gund de biratî hebû.

Piştî sîstema cerdevaniyê û zilm û zordariya hêzên dewletê çi tesîr (bandor) li ser jiyana we kir?

– Berê gundê me Cinata, 300 mal bû. Ji ber ku bax û bostan, rez û pezê me gelek bûn, rewşa me baş bû. Lê piştî ku sîstema cerdevaniyê derket, nema hiştin ku em erdên xwe biçînin, sewalên xwe biçêrînin. Dixwestin ku em jî wekî wan bibin cerdevan, ji ber ku me qebûl nekir, dest danîn ser pezên me, erdên me. Ji destpêka sala 1994'an bi vir de, zordarî her diçe zêde dibe. Heta vê gavê, ji sed carî zêdetir avêtine ser gund û digotin: "Hûn PKK'ê dihewînin, hûn wan diparêzin, hûn tev terorîst in."



Zarokên kurdan li Edeneyê jî awayê jiyana xwe naguherînin.

Ji xeynî we ev zilm û zordarî li gundên cîranê we jî dibûn an na? Kîjan gundan tadeyî didîtin û ji hêla cerdevanên kîjan gundan ve dibûn?

– Wekî tê zanîn, 44 gund girêdayî Mehsertê ne. Ji van 44 gundan 39 gund, an tev an jî qismekî wan hatiye valakirin û şewitandin. Gundê ku bûne cerdevan û ku van zilmê li derdora xwe dikin 4–5 gund in. Navê gundê ku bûne cerdevan ev in; Terê, Xerzikê, Erebo, Mermarê, Biyertê û Kudê ye. Zilm û zordariya cerdevanên van gundan ku tê kirin, di dema xwe de Hîtler jî nedikir.

Em werin dema derketina we. Valakirina gund çawa dest pê kir?

– Beriya 15 rojan tîmên taybet û cerdevanên gundê Terê, Tinatê û Mihelmiya hatin gund. Ji me re gotin; "An hûnê bibin cerdevan, an jî siktir bibin herin." Hinek ji me berê derketibûn. Kesên di gund de mabûn em nêzîkê 10 mal bûn. Me got: "Em nabin cerdevan û me eşyayên xwe çend parçe bar kirin. Serbaz ji me re got: "Hê ku me hûn nekuştine biqeşitin herin, ezê vêga xaniyê we bişewitînim" leşker û cerdevanan bera me dan, li me xistin. Cam û şibakên me tev şikandin. Kesên ku derketin, beriya derketina xwe heywanên xwe yê ku bi 100 milyonî nedihatin kirîn bi 10 milyonî firotin an jî dewlet bi saxîtî heywan dişewitandin.

Rewşa we yê li Edeneyê çawa ye?

– Em perîşan in, ev 15 roj in ku em hatine, tu kar û xebat tune ye ku em bikin. Me bêriya welatê xwe kiriye. Germa Edeneyê jî wekî Edeneyê nexweş e, zarokên me şev û roj digirîn. Em 10 kes di vî xaniyî de jiyana xwe berdewam dikin. Zehf zor e, bira zehf zor e!...

Hevalê Mihemed, gotina we ya dawî çi ye, hûn der heqê welat de çi difikirin?

– Wa ye hûn dibînin, em di kur de derketine. Em bimirîn jî em nabin cerdevan û bênamûs. Em ne ji bo xweşî û çavreşiya Edeneyê hatine vê derê. Em serbilind û serfiraz in ji ber ku em neketine xwîna birayên xwe. Em bizanibin emê ji birçîna bimirin jî em nabin cerdevan. Lê hêviya me jî ne dûr e. Dîsa dawiya dawî welat welatê me ye, ne yê cerdevanan e. Kengê hebe, emê dagerin welatê xwe. Baweriya me bi doza me heye, baweriya me bi şehîdên me û şervanên me heye. Cerdevan xwinmij in. Bimre birakujî, bijî doza me.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ



Kurdên koçber: Em bimrin jî nabin cerdevan.

BI BERPIRSIYARÊ GIŞTÎ YÊ KOVARA NÛBIHARÊ SABAH KARA RE SO

Divê rewşenbîr bi berçavkên reş û spî li cîha

● Zikê çandê pir fireh e, bi zebeşekê ew têr nabe; nan divê , penîr divê, goşt divê gelek tiştên din divê, ji ber ku texesus di nav kurdan de bi pêş ve neçûye. Em hem şaîrtiyê, hem mutercîmiyê, hem siyasetvaniyê, hem jî hin tiştên din dikin. Çunku qedera kurdan ev e. Qedera gelek gelê bindest jî ev e.

● Wexta ez li ser Feqeyê Teyran difikirim ez nizanim çima, lê Yunus Emre tê bîra min. Ez Baba Tahir pir diecibînim. Bi baweriya min, ji aliyê helbestê ve Baba Tahir ji Xeyam mezintir e. Ji ber wê yekê, ez beytên Baba Tahir j zaravayê lorî werdigerînim kurmancî ji bo ku kurmanc wî binasin. Ew bi xwe jî kurd e.

● Zimanê ku nêzîkî hev in, an jî di eynî malbatê de ne, karin alikariya hevûdin bikin. Zimanê farisî ji ber ku zimanê dewletî ye pir hatiye xebitandin û lê xwedî hatiye derketin, çandeke fireh bi vî zimanî hatiye pêk anîn. Ez jî dixwazim ji vê çavkaniya berfireh îstîfade bikim. Ji ber ku farisî nêzîkî zimanê kurdî ye ez li ser wî zimanî pir disekinim.

Kîye Sabah Kara, ji ku tê û diçe ku?

– Di sala 1977'an de min dest bi nivîskariyê kiriye, yanî ji hingê ve nivîsên min hatine weşandin. Ji wê demê ta sala 80'yê min bi tirkî dinivîsî, paşê carinan min ji xwe re digot: "Çima ez bi kurdî nanivîsim," lê gelek asteng li ber min hebûn. Yek, yên bi kurdî re eleqedar hindik bûn. Li aliyê din ev fikra umetê jî heta cihekî dibû asteng li ber nivîsandina bi kurdî. Mesela bi qasî erebî me serê xwe bi kurdî re neêşand, me lizûm nedidît serê xwe bi kurdî re bîêşînin, lê piştî 12 îlonê rojekê, hevalekî ez dawetî gundekî Qoserê kirim, ez çûm wê derê. Min nivîsên xwe ji gundiyan re dixwendin û gelek tiştên din ji wan re bi tirkî vedigotin. Pêvajoya deh rojan wisa domiya, min lê nihêrî ku ez bi zimanê tirkî baş bi wan nadim fêmkirin. Dû re min eynî tişt bi kurdî ji wan re vegotin, min mêze kir ku di demeke pir kin de tiştên kurdî gelek baş fêm dikin. Ji hingê ve ez li ser kurdî dixebitim.

Hûn însanekî pir rengîn in, yanê hûn bi gelek mijaran re eleqadar dibin. Hûn bi şeklî naşibin mirovê ku bi destekî du zebeşan hildigire?

– Xwezî du zebeş bûna, ji du zebeşan zêdetir in. Dema min dest bi zimanê kurdî kir, ez difikirîm ku gelek kes hene li ser zimanê kurdî dixebitin. Lê dema ez ketim navê, min dît ku kesên li ser zimanê kurdî cidî dixebitin, pir kêm in. Zikê çandê pir fireh e, bi zebeşekê ew têr nabe; nan divê , penîr divê, goşt divê gelek tiştên din divê, ji ber ku texesus di nav kurdan de bi pêş ve ne çûye. Em hem şaîrtiyê, hem mutercîmiyê, hem siyasetvaniyê, hem jî hin tiştên din dikin. Çunku qedera kurdan ev e. Qedera gelek gelê bindest jî ev e.

Hûn di nava xebata çapemeniya kurdî de ne, di warê zimên de çi astengiyên we hene? Mesela peyvên kurdî têrî we dikin.

– Dema em tiştekî dinivîsin derdê me ew e ku gelê me, însanên me ji me fêm bikin. Şexsen ê min di nivîsandinê de, di şiîran de heta niha ez bi problemeke mezin re rû bi rû nehatime, yanê kurdî ji tirkî rehetîr dinivîsînim. Lê astenga me sewiya gel e, sewiya gelê me pir li paş e, di xwendin û nivîsandinê de. Mesela ez gelek caran cumleyên pir baş ava dikim, lê dû re ez wan diguherînim û bi şiklekî hêsantir dinivîsim da ku gel jê fêm bike.

Bala min dikşîne ku hûn alfabayeke nû jî pêşkêş dikin, hûn bi alfabeya xwe ewle ne? Wek pisporekî ziman hûn dikarin bibêjin ku ev alfabeya we têkuz e?

– Li devera ku kesên du çavên wan hene, nebin, yên bi çavekî dibêjin "Em axa ne". Rewşa me jî dişibe wê, ji ber ku pisporên me yên mezin kêm in an jî nîn in, divê em bikin. Ev jî ji mecbûriyetê tê. Li aliyê din, dawiya pisporiyê nîn e; mirov dikare bibêje ku despêkek ji pisporiyê re heye, lê dawiya wê nîn e. Pisporiya mirov bi berhemên mirov diyar dibe, emê jî vî karî bikin. Eger em bigîhin deverekê, wê pisporiya me xuya bike. Meseleya alfebeyê jî bi qasî ku ez dibînim kes ji vê alfabeye ne razî ne. Problemên alfabeya me ya latînî hene. Bila yekîtiya alfabeyê pêk bê, em vê dibêjin. Di hemû pirsgirêkan de em vê dibêjin.

Em bên ser werger û helbestê. Ji ber ku hûn hem bi wergerê re hem jî bi helbestê re eleqadar in. Di nav şaîrên kurd de ji aliyê hûnerî ve hûn kê diecibînin. Û gava em wan helbestvanan bi yên rojhilatî yên ne kurd re muqayese bikin cihê wan li ku ye?

– Ez helbestên Melayê Cizîrî pir diecibînim, lê Melayê Cizirî mixabin zimane wî ne yê îro ye. Gelek însan nikarin jê îstîfade bikin. Eger ji destê min bê, niyeta min heye ezê helbesetên wî wergerînim zimanê îro. Zimanê Ehmedê Xanî ji yê wî zelaltir û hêsantir e. Qet ne be, însanên pispor dikarin ji zimanê Ehmedê Xanî fêm bikin. Bi baweriya min, di tarixa mesnewiyan de Mem û Zîn cihekî pir girîng digire. Feqeyê Teyran şaîrekî baş e. Wexta ez li ser Feqeyê Teyran difikirim ez nizanim çima, lê Yunus Emre tê bîra min. Ez Baba Tahir pir diecibînim. Bi baweriya min, ji aliyê helbestê ve Baba Tahir ji Xeyam mezintir e. Ji ber wê yekê, ez beytên Baba Tahir j zaravayê lorî werdigerînim kurmancî ji bo ku kurmanc wî binasin. Ew bi xwe jî kurd e. Mevluda Batê ji aliyê ziman diecibînim, lê di naveroka wê de pir tiştên ne rast hene, lê Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran ji aliyê naverokê ve jî baş in. Ji aliyê helbestê ve ereb, îranî û heta tirk jî, ji me pêşketir in îro. Lê di dema Melayê Cizîrî de ne wisa bû. Heta di dema xwe de Ehmedê Xanî ji wan pêşketîtir bû. Yanê di nav demê de ew bi pêş ve çûne, em jî li cihê xwe sekinîne. Mesela îro şaîrê me yê mezin Cegerxwîn e, lê gelek şiîrên wî ne şiîr in.û kafiyeyên gelek şiîrên Cegerxwîn hene, lê ew bi xwe ne şiîr in. Şaîrên kurd ên vê demê pir qels in, di çîrok, roman û kitêbên ilmî de jî em pir li paş in.

Di warê wergerê de hûn kîjan zimanan bi kar tînin?

– Zimanê ku nêzîkî hev in, an jî di eynî malbatê de ne, karin alikariya hevûdin bikin. Zimanê farisî ji ber ku zimanê dewletî ye pir hatiye xebitandin û lê xwedî hatiye derketin, çandeke fireh bi vî zimanî hatiye pêk anîn. Ez jî dixwazim ji vê çavkaniya berfireh îstîfade bikim. Ji ber ku farisî nêzîkî zimanê kurdî ye ez li ser wî zimanî pir disekinim.

Em werin ser mijara siyasî, di her sergotara "Nûbiharê" de hûn li ser mijareke siyasî disekinin û li gorî xwe teklîfan tînin. Mesela hûn dibêjin li pey dînên resmî, mezhebên resmî neçin. Gelo hûn bi van gotinan dixwazin çi îfade bikin?

– Her sîstema ku gel qebûl nake, lê yên ku alîgirê dewletê ne qebûl dikin, divê neyê qebûlkirin. Divê gel bi rizaya xwe sîstem, mezheb an jî dîn qebûl bikin. Eger gel ew qebûl nekirin, lê bi zorê tu bi wan bidî qebûlkirin. Hingê ew dibin yên resmî, ew nabin yên gel. Ya ku em li ser disekinin ew e. Pirsa ku em ji xwe dikin û em dibêjin: "Peyamber çima şoreşek bi kuştina hinekan û bi terorê nexwest ku bigihê cihekî. Tevî tehde û zilma lê dikirin, wî tehemûl dikir û rê ne dida ku taraftarên wî bi xencer û şûr herin Ebû Cehil, Ebû Lehib û yên din bikujin. Li benda wê ma ku gel qebûl bike, piraniya gel qebûl bike." Di Quranê de jî tê gotin ku di dan-



EKE PIRENG

nenêrin



qebûlkirinê de zor û cerb nîn e. Dijminatî tenê ji zaliman re ye. Yanê dibêje dijminatiya kafiran jî nekin, tenê ya zaliman bikin.

Kurd jî bi giştî misilman in, lê ew di nav umeta îslamê de wekî zarokekî sêwî ne. Ev ji ber çi ye?

– Sebeb yek nîn e. Yanê du alî jî sûcdar in. Kurdan bi xwe jî wezîfeya xwe nekirin. Misilmanên din jî li gorî îslamê hareket nekirine. Di têkiliyên misilmanên din ên bi kurdan re, de malesef, prensibên îslamê zêde li ber çavan nehatine girtin. Lê ev rewş yekalî nîn e. Nexweşî ji mîkroban tenê pêk nayên. Dema ku bedena me jî ji mikorban re hazir nebe û lewaz nîn be, mîkrob nikarin bikevine bedena mirov. Naxwe emê li herdu aliyan binêrin emê tim û tim ji dijminên xwe şikayetan nekin, erê emê şikayetê bikin, lê ne tenê ji wan. Emê li xwe jî binêrin. Me çi kiriye ku wisa bûye? Gelo me wezîfeya xwe kiriye yan na? Bi baweriya min kurd bi xwe jî mesûl in ji vê rewşê.

Di hiqûqa îslamê de mirovên dinyayê tev birayê me ne. Heke dîn tune be, di esil de birayê me ne, ku em tev jî ji Adem û Hewwa hatine. Ji ber vê yeke em tiştê ji xwe re dixwazin divê em ji mirovan tevan re bixwazin. Ên ne misilman jî bin li gorî îslamê misilman mecbûr in ku tiştên ji xwe re dixwazin, ji wan re jî bixwazin. Lê em dibînin di tarîxa îslamiyetê de malesef di gel vî qasî heqîqeta îslamê ev e, lê weqayet (tiştê bûyî) ne wisa bûye, gelek caran wisa nebûye.

Em werin ser meseleya Îranê, dewlata Îranê. Hûn dikarin bibêjin ku kurdên îro di bin hukmê wan de ne, li gorî îslamiyetê gihîştine mafên xwe?

– Na ne mumkûn e mirov wê bibêje. Di destpêka hevpeyvînê de min got tiştê ku mirov ji xwe re dixwaze, divê mirov ji birayê xwe re jî bixwazê. Vêca gelo tiştên ku farisan bi dest xistine, kurdan bi dest xistine? Yanî, mesela kurd zimanê xwe di dibistanan de bi şiklê resmî wekî farisan bi serbestî dikarin fêr bibin an na? Dema ku em wan pirsan dikin, em dibînin ku wisa nîn e, lê belê ez dikarim vê bibêjim: Bi qasî ez dizanim, kurd li tu deverên dinyayê bi qasî li Îranê azad nîn in. Erê azadiyekê baş nîn e, erê pir noqsan e, lê belê mesele mirov nikare Îranê bi Tirkiyeyê, bi Iraqê û bi Suriyeyê re miqayese bike.

Em bên ser tevgerên îslamî? Çi li bakurê Kurdistanê çi li Tirkiyeyê der heqê wan de hûn çi difikrin?

– Prensîbeke me heye, prensîbeke îslamî ye, kesê ku zilmê bike ne ji me ye. Kesê ku li hemberî zilmê şer bike çi misilman, çi ne misilman, em lê xwedî derdikevin. Di hemû xebatên wan ên însanî û rast de em mecbûr in alîkariya wan bikin. Ên ku terefdariya dewletê dikin em nêzîkî xwe nabînin, ên ku terefdariya mezlûman dikin çi kurd, çi ne kurd em nêzîkî xwe dibînin. Mesela em Ahmet Altan nêzîkî xwe dibînin, Îsmail Beşikçi nêzîkî xwe dibînin. Kesên ku ne kurd in, lê li mezlûman xwedî derdikevin em nêzîkî xwe dibînin. Em di nav misilmanan de jî li hadîseyê wisa dinêrin. Kesên ku terefdariya zilmê dikin, Fettullah Gulen mesela, em ji xwe dûr dihesibînin. Li gorî min ferqeke mezin di navbera Fetullah Gülen û Türkeş de nîn e.

Bedîuzzeman kurd bû, ji bo kurdan jî xebitî, ji bo zimanê kurdan jî xebitî, li kurdbûna xwe xwedî derket. Lê ew di zemanê Cumhuriyetê de hêdî hêdî bi paş ve çûye, ji mecburiyetê, ji ber ku mişextî bûye, mişextî jî ne li Kurdistanê bûye, mecal nedîtiye ku li kurdan xwedî derkeve. Ji ber vê yekê telebeyên Bedîuzzeman ji grûbên din hazirtir in ku li kurdan xwedî derkevin. Bedîuzzeman heta dema cumhuriyetê paşnavê xwe wekî "kurdî" nivîsandiye . "Nursî" paşê lê kirine, wî bi xwe ji xwe re negotiye "Nursî".

Ji nivîsên we tama felsefeya jî tê. Ku mirov li kaînatê, li dinyayê dinêre, pirrengiyekê dibîne, ji dar û ber û hêşinayê bigire, ji beşeriyê, ji kulturê û her wiha devera ku hûn jê tên wekî bajarê Nisêbînê jî pirerengiyek heye. Hûn çawa lê dinêrin, hûn diparêzin ku ew tev bibe yek kultur, her tişt li gorî îslamiyetê, wisa dibe?

– Îslamiyet, yek tişt nîn e. Xwedêtala di Quranê de balê dikşîne ku suneta Xwedê jî heye. Suneta Xwedê çi ye ? Şewitandina agir e, ew jî ayetek ji ayetên Xwedê ye. Yanî prensîbên kaînatê jî ayetên Xwedê ne. Tu zanî ku tu destê xwe bavêjî agir, wê agir destê te bişewitîne. Ji xwe şewitandina agir ayetek ji ayetên Xwedê ye. Ku tu nexwazî destê xwe bişewitînî, destê xwe nevêje agir. Di girtina hukme Xwedê de qeyd û bend hene. Ew qeyd kirine, lê em li aliyê din azad in heta derekê. Emê lê bigerin, emê peyda bikin. Emê lê bikolin. Îcar yê me, dema ku em dibêjin îslam, em îslama di Quranê de û gotinen kirdarên peyamber tenê qest nakin. Em suneta Xwedê jî qest dikin, li gorî suneta Xwedê ger şeytan jî tiştekî rast bêjê emê qebûl bikin, ev jî suneta Xwedê ye.

Careke din li gorî suneta Xwedê eger misilman tiştekî ne baş bêjin emê red bikin, ew jî suneta Xwedê ye. Mîsal gotineke şeytên di Quranê de heye ku Xwedê neqil kiriye, ku rast e. Însanên ku diçin cehnemê ji şeytên re dibêjin: "Tu bûyî sebeb ku em ketin vê derê." Wê şeytan jî ji wan re dibêje: "Ez bûme bahane. Jixwe hûn bi vir de dihatin, yanî hûn hazir bûn, hûn ne xebitîn ku xwe ji vî halî xelas bikin, hûn bi vir de dihatin, min jî riya we vekir."

Nexweşî ji mîkroban tenê pêk nayên. Dema ku bedena me jî ji mikorban re hazir nebe û lewaz nîn be, mîkrob nikarin bikevine bedena me. Naxwe emê li herdu aliyan binêrin emê tim û tim ji dijminên xwe şikayetan nekin, erê emê şikayetê bikin lê ne tenê ji wan. Emê li xwe jî binêrin. Me çi kiriye ku wisa bûye?

Ku gotina şeytên di Quranaê de cih bigire û em qebûl bikin, emê çawa gotina Sartre û Kafka û Camus qebûl nekin?

Yekî misilman ku şertên îslamê neyine cih..?

– Kesê ku misilman be eger misilmaniyê red neke, mesela nimêjê red neke, lê nimêj jî neke, dibe gunehkar, lê ji dîn dernakeve. Di îslamê de heqê însan heye û heqê Xwedê heye, Xwedê dikare ji heqê xwe bibore, nlimêj, hec, zekat heqê Xwedê ne. Lê Xwedê heqê mirovan efû nake. Mesela di tarîxa îslamiyetê de gelek însanan nimêj nekirine, an jî carinan kirine, lê dîsa jî ew misilman in.

Yekî ku misilman be û heta cihekî misilmantiya xwe pêk jî anîbe, piştî cihekî jî mafê vî heye îslamiyetê red bike?

– Ew minaqeşeyeke mezin e di nav misilmanan de, aliman ji îslamiyetê gotine "Ew kes murted in, divê ew bên kuştin." Hin alim jî dibêjin; "Emê li niyetê binêrin, ka bi çi niyetê bûne misilman û vegeriya ye." Ew kesên ji bo ku îslamiyetê ji nêz ve binasin ketine navê, her tiştê wê binasin û paşê derkevin bikevin nav dijmin, îslamiyetê hin ji wan kesan kuştine. Yanî ne bi niyeteke baş ketine nav îslameyetê û dev jê berdane. Îcar fikreke din jî heye, li gorî îslamê, mirov eger samîmî be, yanî eger baweriya yekî piştî cihekî bi rastî jî êdî bi îslamiyetê tunebe, wê çaxê ew serbest e . Baweriya min jî fikra duyemîn e. Kesê ku bi meqset ketibe û vegiriyabe ji bo ku teredûdê bixe nav misilmanan ew murted e, lê eger niyeteke xirab tunebe li holê, bi baweriya min dikare dev ji îslamê berde.

Şerê ku niha li Kurdistana bakur ber dewam e hûn çawa dinirxînin bi gotineke din di neynika we de PKK çawa xuya dike.

– Em li dinyayê bi çavên reş û spî nanêrin, ez bawer im şertên rewşenbiriyê jî ew in. Gerek e rewşenbîr bi çavên reş û spî li dinyayê nenêrin, bi çavên qenc an jî neqenc nenêrin. PKK ji gelek aliyan ve tiştên ku dike maqûl in, tiştine hene ku dike jî makul nîn in, em qebûl nakin. Ez bawer im sebebê hin xeletiyen PKK'ê, ne PKK ye dewlet e, yanî dewletê zemîn ji wan xeletiyan re hazir kiriye, xeletiya mezin a ku ez di PKK'ê de dibînim ew e ku PKK dixwaze hemû kurd di bin serokatiya wê de bên cem hev, zorê bide kurdan ku civatên (teşkîlatên) cihê çênekin. Bi baweriya min ev tişt muxalîfê azadiyê ye. Divê ku PKK prensîbên xwe deyne holê û ji hemû grûban bixwaze ku li ser wan prensîban munaqeşeyê bikin, ka qebûl dikin an na.

Bi baweriya min hingê wê hemû prensîbên rast bêne qebûlkirin, lê dema ku bi zorê be, ew muxalifê azadiyê ye. Ez dibêjim eger çend teştîlat jî hebin, her teşkîlat bêyî ku astengan ji hev re derînin û bikarin di cihê lazim de alîkariyê bi hev re bikin, hingê baş e.

Li ser avabûna Parlemetoya li Derve û televizyona MED'ê hûn çawa difikirin?

– Bi baweriya min her du jî pir giring in û gavên tarîxî ne. Lê bi qasî ku giring in, lazim in têkuz jî bibin. Dema ne tekûz bin îmkanê ku hene jî, ji dest diçin. Mesela dema ew parlemeto bi ser nekeve û piştî demeke din yeke din bête avakirin hingê wê bibêjin "Ne we yek ava kiribû, îcar ev çi ye." Lê ku ew bixebitin parlemto heqeten jî bibe parlemento, hingê gelek baş e. Di parlementoya derve de hin çewtî hene mesela gelek hêzên kurd tê de cih negirtine? Lê her çiqas ev parlemento wek parlementoya PKK jî xuya dike, gavên baş bavêje biryarên rast bistîne, mumkûn e ku ew parlemento, ji bo civandina kurdan bibe bingehek. Ez hêvîdar im ku bi mejiyekî fireh li bûyeran binêre wê tiştên baş pêk bîne.

TV–MED jî hesreteke pir dûvdirêj e ji bo me. Ez bawer im gelê bindest ên ku îmkanên wan ên dewletî nîn in, ji gelên din zêdetir îhtiyaciya wan bi radyo û tv'yan heye, lewra mektebên wan nîn in, xwendin û nivîsandin bi pêş ve naçe. Gelê bindest tim û tim bi bihîstinê siyaseta xwe dimeşîne, ilmê xwe, zanîna xwe û adetên xwe bibîhistinê dimeşîne. Ji ber vê yekê tv ji bo kurdan pir girîng e, lê ev jî eynî wekî parlementoyê divê bêtarafgirî weşana xwe bidomîne. Eger rastiyan bibêje, personelên baş bixebitîne wê bibe gaveke dîrokî.

HEVPEYVÎN: ZANA FARQÎNÎ

www.serxwebun.org

Gerîlayên Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan livbaziyên xwe li Çukurovayê gur dikin

Şerê çekdar ber bi Tirkiyeyê ve diçe

Gerîlayên ARGK'ê her diçe seheya şer ber firehtir dikin. Rojekê li Dersim, rojek li Botan, rojekê li Çukurovayê êrîşan pêk tînin. Bi dijwariya şer, zayîatên leşkeran jî her diçe zêdetir dibe. Wisa xuya ye ku ev havîn wê gelek dijwar bibore.

13.06.1995

Di 11'ê pûşperê (hezîran) de, hêzên dewletê li warê Akdağ ku di nav sînorê Paloyê de ye, ketin kemîna gerîlayan. Piştî kemîna gerîlayan lihevxistinê heta êvarê dewam kir. Di encamê de 30 leşker mirin, subeyek jî birîndar bû.

Leşker di vekişîna operasyonê de, li Sasonê, li warê Bekirhan ketin xefika gerîlayan. Gerîlayan di xefikê de 10 leşker kuştin û 3 leşker jî birîndar kirin.

Li Exîla Amedê, gerîlayan cerdî ser gundê cerdevanên Terzika kirin. Di cerda gerîlayan de 4 cerdevan mirin, 2 cerdevan jî birîndar bûn.

Li Botan gerîlayên ARGK'ê, êrîşî qereqola Arûşa kirin, di lihevxistinê de gerîla bi roket û mayînan nêzîkî 30 leşkerî kuştin. Li gorî agahiyên Kurd–A'yê, 8 ji wan jî bi teqîna mayînan mirine.

Gerîlayên ARGK'ê, di 10'ê pûşperê de riya Elkê (Beytuşebab) û Faraşî xistin kontrola xwe. Di kontrolê de gerîla 3 cerdevan dîl girtin.

Hêzên dewletê, gundê başûrê Kurdistanê Hedîne, dan ber topê havanan. Di bombebaranê de 2 gundî mirin.

14.06.1995

Li çiyayê Gabarê, gerîlayên ARGK'ê êrîş birin ser mewziyeke leşkerên li dora Tugaya Sesliceyê. Di cerda gerîlayan de 2 leşker mirin.

Gerîlayên ARGK'ê li çiyayê Cûdî, cerdî qefleyek leşker kirin. Di êrîşê de leşkerek mir, yek jî birîndar bû.

Gerîla bi ser Dihê (Eruh) ve girtin û êrîşî leşkerên di navçeyê de kirin. Di lihevxistinê de 5 leşker mirin û gelek jî birîndar bûn.

Hêzên dewletê li Çiyayê Namazê, ketin kemîna gerîlayan. Di kemînê de, gerîla bi nalrîncokan (bombeyên destan) 5 leşker kuştin û nêzîkî 20 leşkerî jî birîndar kirin.

15.6.1995

Di navbera Geverê (Yüksekova) û Esendereyê de, tankeke leşkerî kete kemîna gerîlayan. Di kemînê de tank bi derba roketa B–7 îmha bû û 4 leşkerên ku di tankê de bûn jî, mirin.

Li Geverê di navbera warê Xumaro û Şehîdan de, gerîlayan cerdî leşkerên ku derketibûn operasyonê, kirin. Di êrîşê de 15 leşker mirin. Hêzên dewletê dev ji operasyonê berdan û vekişiyan.



Gerîla giraniyê didin cerdên li ser qereqolan

Konvoyeke leşkerî, li nêzîkî Midyadê, di cadeya Botaşê de kete xefika gerîlayan. Di xefikê de 4 erebeyên leşkerî îmha bûn. Der heqê mirî û birîndaran de agahî tune ne.

Gerîlayên ARGK'ê li Çewlikê (Bingöl) di navbera qereqolên Hamamler û Golê de, leşker xistin kemîna xwe. Di kemînê de 2 leşker mirin û 5 jî leşker birîndar bûn.

16.06.1995

Li Behdînan, li warê şehindan di lihevxistina ku 13'ê pûşperê çêbû de, li gorî agahiyên Kurd–A'yê 30 leşker û 2 gerîla mirin.

Cerdevanên gundê Talê ku parastina riya Çelê û Şemezînanê dikin li hev xistin. Di lihevxistinê de cerdevanek mir.

Hêzên dewletê, li Amedê bi bombebaranê agir berdidin daristanan.

17.06.1995

Gerîlayên ARGK'ê êrîşî qereqola Nazimiyê (Qisle) kirin. Di cerda gerîlayan de 2 leşker mirin, 5 leşker jî birîndar bûn.

Li çiyayên Gabar, Herekol û Çiravê di navbera hêzên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer didome. Li Gabarê gerîlayan êrîşî mewziyeke leşkeran kirin. Di lihevxistinê de 2 leşker mirin, 2 leşker jî birîndar bûn.

Operasyona hêzên dewletê, li Dersimê didome. Li gorî agahiyên ku gihîştin destê me, firoke û balefir, der dora Dêrsimê bomberan dikin.

18.06.1995

Li nêzîkî Silopiyê, jîpeke leşkerî li mayîna gerîlayan leqitî. Usteymenek û 6 leşker mirin.

Gerîlayên di riya Mele Alîkê de ku li Farqînê ye, 2 panzerên leşkeran xistin kemîna xwe. Piştî kemînê di navbera leşker û gerîlayan de şer derket. Der heqê zayîatên leşkeran de agahî bi dest neketin.

Mînîbûseke cerdevanan di riya ziyaret û Motkê de, li mayîna gerîlayan qelibî, 7 cerdevan mirin, 7 cerdevan jî birîndar bûn.

Gerîlayên ARGK'ê di riya Bilîs û Sêrtê de, erebeyeke leşkerî xistin kemîna xwe. Di encama kemînê de 6 leşker birîndar bûn.

19.06.1995

Hêzên dewletê, di 18'ê pûşperê de li Botan dest bi operasyonekê kirin. Li gorî agahiyan operasyon bi taybetî li warê Ciraw dewam dike û car caran jî di navbera gerîla û leşkeran de şer dertê.

Gerîlayên ARGK'ê di 17'ê pûşperê de bi ser Tabura ku li Çiyayê Cûdî, li milê Goriyan de cih girtibû, kirin. Di cerda gerîlayan de, 10 leşker mirin, gerîla dest danîn ser malzemeyên cur bi cur.

Di riya Çelê (Çukurca) û Ertuşê de, gerîlayan cerdî leşkerên ku rê diparêzin, kir. Di cerdê de 6 leşker mirin, yek jî birîndar bû.

Li mintiqeya Kerboranê, bi şev di navbera gerîla û leşkeran de lihevxistinek qewimî. Di encama lihevxistinê de 2 leşker mirin, gerîlayek jî birîndar bû.

Di riya Tûxê (Tatvan) û Westanê (Gevas) de erebeyeke cerdevanan li mayîna gerîlayan leqitî, di vê bûyerê de cerdevanek mir, 3 cerdevan jî birîndar bûn.

20.06.1995

Li Botan, di riya Zevên de mayîna gerîlayan li ber leşkeran teqiya. Bi teqînê leşkerek mir, yek jî birîndar bû. Li warê Geverdeyê jî 3 leşker bi mayînan mirin.

Gerîlayan şeva 18'ê pûşperê, li riya Çewlik (Bingöl) û Amedê konvayeke leşkerî xistin kemîna xwe. Di kemînê de 6 cemse îmha bûn, der heqê mirî û birîndarên leşkeran de agahî bi dest neketin.

Operasyona hêzên dewletê li Botan didome. Li gorî agahiyen ku gihîştin destê me, firoke dora ava Hacibeg bomberan dikin.

Kurd–A/ Welatê Me

Li Beysosenê 50 leşker mirin, 5 leşker jî dîl ketin

Gerîlayên ARGK'ê di 15'ê pûşperê (hezîran) de êrîş birin ser qereqola Beysosena ku li ser Çelê (Çukurca) ye. Di cerda gerîlayan de 50 leşker û 4 gerîla mirin, 5 leşker jî dîl ketin destê gerîlayan.

Li gorî agahiyên Ajansa Kurd–A'yê, gerîlayan ji 5 milan ve êrîşî qereqolê kirine, di 45 deqîqeyan de qereqol bi dest xistine û piştre jî trafo û cebilxane berbihewa birine. Gerîlayan 4 dozerên ku nêzîkî qereqolê bûn jî, şewitandine. Di encama bûyerê de, li gorî agahiyên ku gerîlayan ji bêtêlên leşkeran standine 50 leşker mirine. Li gorî agahiya gerîlayan, di vê bûyerê de 4 gerîla jî mirine. Navên leşkerên ku dîl ketine destê gerîlayan ev in: Hakan Pusat–Enqere, Tuncay Kabaklıoğlu– Stenbol, Mehmet Sıkılgan– Kırşehir, Ramazan Çelik Kayserî, İsmail Başaran– Çanakkale.

Ambargo gihîşte bajaran

Ambargoya ku ji rêzbera (îlon) 1994'an ve li ser gundên Dersimê dewam dike, îcar li taxên Dersimê dest pê kir. Li taxên Senk (Atatürk), Gazik (Cumhuriyet), Kanoğlu û İsmetpaşa xelk bi beyanameyên wîlayetê danûstandinê dikin.

Piştî rêzbera 1994' an bi destpêka operasyonên hêzên dewletê re li gund û navçeyên Dersimê ambargoya xwarin û kincan dest pê kiribû. Ev demek e piştî gundan li nava bajêr jî ambargoya xwarin û kincan destpêkir.

Ji bo xelkên li taxên Dersimê rûdinin, bikaribin danûstandinê bikin, divêt ji Muduriyeta Nifusê beyanameya malbata xwe bistînin û li gorî hejmara wan jî tiştan bikirin.

Li gorî agahiyên gihîştin destê me, ambargo bi hinceta ku alîkariya xwarin û kincan negihîje gerîla, hatiye danîn.

Cuco: Ji kurdan re otonomî

Di civîna Asambleya Parlementerên Yekîtiya Ewrûpaya Rojava de rapora ku senatorê Îtalyanî Alfons Cuco hazir kiribû, hate qebûlkirin.

Civîna vê rêxistinê, di 19'ê pûşperê (hezîran) de li Parîsê, dest pê kiribû. Di civînê de rapora senatorê Îtalyanî Alfons Cuco ku tê de ji bo kurdên Bakûrê Kurdistanê otonomî dihat xwestin, bi piraniya dengên (rayên) parlementeran, hate qebûlkirin. Rapora Cuco, ji 58 rûpelan pêk hatibû. Ji 58 rûpelan 33, li ser meseleya kurdan bû. Ji bilî otonomiyê, Cuco di raporê de diyar dikir ku divê parlementerên DEP'ê bêne berdan, îşkence bêne sekinandin, gund neyên şewitandin, qanûnên Tirkiyeyê li gorî yên Ewrûpayê bêne rastkirin (guhertin) û demokrasiyek têkûz, bê bicihkirin.

www.arsiv.com

Di nav kar û barê saziyên kurdî de rewşa zimanê kurdî çawa ye?

Alo rojbaş, burası...

Li vî bajarê tarîxî (Stenbol), bajarê bizansiyan, gelek saziyên kurdan yên pir muhîm hene û me jî xwest piştî avabûna televîzyona kurd, MED'ê û kampanyaya ku Parlementoya Kurdistanâ ya li Derveyê Welêt, ji bo xwendin, axavtin, nivîsîn û fikirîna bi kurdî, di nav van saziyan (6 heb) de lêkolînekê çêbikin. Gelo, li van saziyan çiqas bi kurdî axavtin çêdibe, piştî TV-MED wê rewşa axavtinê bê guherîn an na? Encam ne baş bû, wekî hercar dîsa temenî, soz û hêvî pir bûn, lê xebat? Ew jî ma bihareke din...

Cara ewil, zimanê mêran xerabû. Lê jinên kurd, ji ber ku têkiliya wan bi saziyên dewletê yên resmî re tune bûn, ji bo parastina zimanê kurdî bûn garantiyek. Piştî demekê ronakbîrên kurd jî zimanê xwe ji bîr kirin. Êdî dewreke nû dest pê kiribû. Bi tirkî peyivîn, fikirîn û nivisîn, wekî destpêka cixare kişandinê bûbû moda. Lê gava elimandin dibin wekî xûy û xisletekî, êdî ji wan xelasî jî ewçend zor dibe. Hele hele di dewreke îro de ku çaraliyên kurdan bi çekên medyatîk hatine dorpêç kirin, jibîrkirina ziman û edetên kurdan yên neteweyî her di talûkê de ne.

Êdî jinên kurd jî hew dikarin bibin garantiya parastina zimanê kurdî, ji ber ku êdî ew jî hînî zimanê medyayê dibin. Nifşên nû, bi reklam û muzîka gelên din mezin dibin, espirî û yariyên wan jî li gorî mentalîteya zimanê wan gelan tê guhartin.

Sedsala Neteweyên Çapemeniyê

Zimanzan dibêjin sedsala 20'an, ya Neteweyên (miletên) Çapemeniyê ye. Li ser Îtalyayê, di nav meha gulanê de di rojnameya Milliyetê de nivîsek derketibû. Di wê nivîsê de rojnamevanekî Îtalyanî digot: "Heta ku televîzyon li Îtalyayê dest bi weşanê kir û piştî weşanê bi demeke dirêj, hê jî li Îtalyayê zimanekî yekgirtî tunebû." Bi gotineke din, başûrê Îtalyayê ji bakur fêm nedikir. Mirov dikare eynî tiştî ji bo Tirkiyeyê jî bêje. Çi wext televîzyonan şaxên xwe yên weşanên gihandin her aliyê van welatan, wê hindê zimanekî yekgirtî çêbû. Li van welatan ji roja ku dewlet hatiye avakirin û bi vir ve perwerdeyî jî bi zimanê van gelan tê kirin, lê incax bi wasiteyeke wekî televîzyon û radyoyê zimanê yekgirtî pêk hatiye.

Gelê kurd, wekî tê zanîn di tu dewrê de li ser erdê xwe, di bin erka dewleta xwe de perwerdeyî bi zimanê kurdî nekiriye. ji ber ku dijminên kurdan nehiştinin ku kurd dewleta xwe çêbikin.

Di nav demên dawîn de, ji Kurdistanê bi milyonan însan, ji ber zilma dewletê, koçî bajarên Tirkiyeyê yên mezin, metropolan dibin. Yek ji van metropolan jî Stenbol e. Li gorî hin kesan, bajarê kurdan yê herî mezin, Stenbol e. Serokê Hereketa Demokrasiya Nû (YDH) Cem Boyner, di axavtineke xwe de got ku zedêyî 2.5 milyon kurd li vî bajarî rûdinin. Li gorî kurdan, ev hejmar pir hindik e, lewra ew dibêjin ku ne di bin 4 milyonan kurd, li Stenbolê dijîn.

Navenda kurdan a nû: Stenbol

Li vî bajarê tarîxî, bajarê bizansiyan, gelek saziyên kurdan yên pir muhîm hene û me jî xwest piştî avabûna televîzyona kurd, MED'ê û kampanyaya ku Parlementoya Kurdistanâ ya li Derveyê Welêt, ji bo xwendin, axavtin, nivisîn û fikirîna bi kurdî, di nav van saziyan (6 heb) de lêkolînekê çêbikin. Gelo, li van saziyan çiqas bi kurdî axavtin çêdibe, piştî TV-MED'ê wê rewşa axavtinê bê guherîn an na? Encam ne baş bû, wekî hercar dîsa temenî, soz û hêvî pir bûn, lê xebat? Ew jî ma bihareke din...

Di vê nûçeya lêkolînî de me çar pirs kirin, pirsa me ya ewilî ev bû: **"Eleqeya we bi zimanê kurdî çiqas e û li saziyên wekî we yên kurdan, zimanê kurdî çiqas tê peyivîn?"** Lê helbet hin sazî hebûn (Kovara Nûbiharê) ku me hewcebi vê pirsê nedît. Lewre ew sazî bi her awayî, bi kurdî dixebitî. Ji ber vê yekê di van pirsan de bersivhen van saziyan jî nîn in.



MEDYA GÜNEŞİ

Rojnameyeke ji panzde rojan carekê bi kurdî–tirkî dihat weşandin, li şûna vê rojnameyê niha Roj derdikeve.

"Di destpêka kar de me xwest em cih bidin zimanê kurdî, hin gav hatin avêtin, lê îstikrar tunebû. Ji ber rewşa siyasî em mecbûr dimînin mesajên xwe bi tirkî bidin. Çimkî zimanê hevpar ê li nav gelên tirk û kurd tirkî ye. Mebesta me ne tenê di warê kulturî de, lê belê di warên din de jî, kurdî bi kar bînin. Wek mînak; ji bilî rojnameya tirkî–kurdî, em difikirin rojnameyeke mehane (Armancê) ku xwerû bi kurdî ye, biweşînin. Axaftin ku li navenda saziyê çêdibe, ne li gorî dilê me ye. Civîn bi tirkî ne. Di rojnameya me de kurdî sembolîk e."

Jîyana Nû

JIYANA NÛ

Rojnameyeke heftane, bi kurdî û tirkî dihat weşandin, vê rojnameyê jî weşana xwe sekinandin û niha li şûna vê Roj derdikeve: Jiyana Nû û Medya Güneşî bi hev re ev rojname derxistin.

"Ji bilî hin rewşên taybet bi giranî bi tirkî tê axaftin. Di hêla teknîkê de bi tirkî tê axaftin, ji ber ku ew kesên di wê sewiyeyê de hebin, tune ne. Yanê dikare bê gotin di demên taybet û sohbetan de kurdî tê axavtin. Helbet ne bes e û ne bi dilê me ye. Gelek asteng li pêş me hene. Ew kesên ku li vir dixebitin, ji ber ku ji dibistanên Tirkiyeyê mezûn bûne û bi kurdiyeke teknîk nizanin ji mecbûrî axaftin û têkilî bi tirkî çêdibe. Civînê me jî bi tirkî ne."



NAVENDAÇANDA MEZOPOTAMYA

Saziyeke çandê –muzîk, tiyatro, resim...– ye, li gelek bajarên Tirkiyeyê û yên Kurdistanê şaxên wê hene.

"Esasa yekemîn, ji ba me, zimanê kurdî ye, bi gotineke din bingeha me çanda kurdan e. Di her warê xebata me de zimanê kurdî bingeh e. Di jiyana rojane de, ji aliyê ziman ve em pêşve çûne, lê biserketin hê maye. Bi tevahî zimanê kurdî ne hakim e. Hevalên ku kurdî dizanîn, ji %60–70'yên wan bi kurdî diaxafiin. Lê havalên ku bi kurdî nizanin, em mecbûr dimînin bi wan re bi tirkî biaxivin. Divê bê zanîn ku NÇM, ne wek rojnameyan e. Ji ber ku çûyîn û hatin pir e. Di nava heftiyekê de nêzîkî hezar kesî, vê saziyê ziyaret dikin. Heta ku ji me tê, em dixwazin bi kurdî bipeyivin. Mîxabin di nav wî hezarî de nêzîkî pênsed kes bi kurdiyeke pak nizanin. Em bi kurdî (di jiyana xwe de) nafikirin."

RONAHÎ

RONAHÎ

Rojnameyeke heftane, bi tirkî û kurdî ye.

"Eleqeya me ya bi zimanê kurdî re kifş e. Em rojnameyeke bi kurdî–tirkî dertînin. Navê wê bi xwe jî "Ronahî", yanî bi kurdî ye. Her çiqas bi tirkî jî nivîs derên, ji me re bîngehîn kurdî ye. Li gel rojnameyê em pirtûkên bi kurdî jî çap dikin. Em di rojname û pirtûkên xwe de ji %40–50 kurdî bi kar tînin. Rojnameya me ji ber ku kurdî–tirkî ye, di nav xebatkarên me de tirk jî hene. Em xebatkarên kurd, di nav xwe de bi kurdî diaxivin. Lê hevalên me yên tirk ji ber ku bi kurdî nizanin, bi wan re axaftin bi tirkî ye. Dîsa bi mêvanên xwe yê kurd re bi kurdî, bi yên tirk re jî axaftina me bi tirkî ye. Lê di axaftina telefonê, an jî name hwd. de bi giranî, kurdî ye. Em di civînê xwe de bi kurdî û tirkî jî diaxivin. Dema em bi hevalên xwe yê tirk re civînekê bikin, zimanê civînê malum e ku wê bi tirkî be. Lê em di civînê xwe yê bi hevalên kurd re di civîn de bi kurdî di axivin."



DOZ

Weşanxaneyeke kurdan e û li ser kurdan bi kurdî–tirkî pirtûkan diweşîne.

"Navê saziyê bi kurdî ye û îmaja wê jî dîsa li ser kurdan e. Li gorî min kêmasiya kurdan a herî mezin ev e. Bi rastî kurd li ser vê problemê jî baş nasekinin. Lazim e ku di jiyana xwe ya taybet û saziyên xwe de bi zimanê xwe bipeyivin û vê ji xwe re bikin siyaseta heri pêş. Me ji bo vê meselê di weşanxaneyê de qerara axaftina kurdî stand. Piştî vê qerarê em gelek kes hîn bûn.

Mirov difikirê ji xeynî navên hin kovar û rojnameyan, tu eleqeya van saziyan bi kurdî re tune û her tişt bi tirkî ye. Ev jî tiştekî ne rast e û çewt e. Kovar û rojnameyên ku bi kurdî–tirkî dinivîsînin, karekî ne baş dikin, çimkî me dîtiye mirovên ku van kovaran û rojnameyan dixwînin, bi tenê nivîsên tirkî dixwînin, yên kurdî jî derbas dikin. Yanê em bi hêsanî dikarin bibêjin ku ev metoda zirarekî mezin dide zimanê kurdî, gere dev ji van tiştan berdin."

Li jêr rêjeya axavtina kurdî ku saziyan daye ev e:

DOZ: Ji % 25–30 bi kurdî tê axavtin

RONAHÎ: Ji % 50 bi kurdî tê axavtin

NÇM: Ji % 50 bi kurdî tê axavtin

JIYANA NÛ: Ji %10–15 bi kurdî tê axavtin

MEDYA GÜNEŞİ: Ji sedî %25 bi kurdî tê axaftin

NÛBIHAR: Ji bilî hin têkiliyên mecbûrî, bi giştî kurdî tê axavtin

Dûmahîk heye

SUUT KILIÇ

Silav li xebatgêriya xwendin–nivîsandin û ramankariya bi kurdî

Bi armanca bipêşvebirin û xurtkirina xebatgêriya xwendin–nivîsandin û ramankariya bi kurdî ku ji layê Parlementoya Kurdistanê ya li Derve ve, ji roja 25'ê pûşpera 1995'an pê ve dest pê kir, di demhijmêr 17.00'yan a roja înê 23.6.1995'an de li Navenda Çanda Mezopotamyayê (Tarlabaşı Bulvarı No: 128 Beyoğlu, tel:256 84 38) kombûneka tevayî hate sazkirin. Bername ji van beşên jêrîn pêk hatibû:

AXAFTIN

1– Berfirehkirina peyvîna bi zimanê kurdî li hemû saziyan.
2– Di telefonan de, rijdbûna li ser peyvînên bi zimanê kurdî.
3– Sazkirina dembuhêrkan bi zimanê kurdî
4– Berhevkirina pêkenîn, gotinên pêşiyan û pîrozbahiyên bi kurdî.
5– Berhevkirin û amadekirina çîrok, dîlok û metelokan bi kurdî
6– Pêkanîna konferans, şahî û komcivînan
7– Weşandina berhemên xwe yên kurt di TV–MED'ê de
8– Sazkirina seredanan ji bo malan
9– Destnîşankirina dirişman bi kurdî
10– Sazkirina rojên şêwekariya ciwan bi kurdî
11– Amadekirina berebaziyên mîna xwendina helbest û çîrokbêjiyên bi xelat
12– Zarvekirina filên bijartî bi kurdî û weşandina wan di TV–MED'ê de
13– Amadekirina kurte–şanoyan (skeç) bi kurdî û weşandina wan di TV–MED'ê de.
14– Sazkirina rojên axaftina bi kurdî, ji bo nimûne.
15– Di rojên diyar û ayînî de xwendina Mewlûdê bi zimanê kurdî.
16– Pêkanîna zincîra telefonê ya "ez dixwazim bi zimanê xwe bipeyivim"

NIVÎSANDIN

1– Amadekirina kaval û afîşan bi zimanê kurdî
2– Afirandin
3– Çapkirina Alfabeyê û belavkirina wê
4– Romanên biwêne
5– Berebeziyên xweş–nivîsînê
6– Amadekirina pirsan ji bo şopandinê.
7– Destpêkirina xebatgêriya nivîsîna nameyan bi zimanê kurdî
8– Di rojên wekî cejn, şahî û govendan de daxwaznameyên bi kurdî
9– Amedekirina pîroznameyan bi kurdî
10– Wergerandina pirtûk û namilkeyên hilbijartî bi kurdî
11– Destpêkirina dersên bi kurdî, (li kolegeh û saziyan)
12– Berhevkirin û nivîsîna pêkenîn, dîlok, metelok, çîrok û çîrvanokên gelêrî.
13– Ji bo fêrkirina bi zimanê kurdî, terxankirina rûpelan di rojnameya Welatê Me de.
14– Daxwendina rojnameya 'Welatê Me' û şandina nivîsan jê re.

RAMANDARÎ

1– Amadekirina şanoyan
2– Pêkanîna gengeşeyan
3– Amadekirin û pirskirina dîlok û metelokên bîrbirinê.
4– Berhevkirina peyv û gotinan
5– Amadekirina kurte– berhemên hunerî (spot) ji bo TV–MED'ê
6– Çêkirina karîkaturan
7– Xwendina û nivîsandina helbestan
8– Di xelatkirinan de, berhemên kurdî hilbijartin.

Protestoyên Navenda Çanda Mezopotamyayê

Zarokên Koma Gulen Mezrabotan li Beyoğluyê, girtina şaxê NÇM'a İzmirê protesto kirin. Zarokan li Pirtûkxaneya Mephisto demarojnamevan Savaş Ay pirtûka xwe ya bi navê "Şahîdên Çavdêr" (Göz Tanığı) îmze dikir, ziyaret kirin.



Navenda Çanda Mezopotamyayê, li gelek deveran bi awayên cur bi cur êrîşên ku hêzên dewletê dibe ser saziyên çandî, protesto kir. Di pêvajoya heftiya çûyî de gelek komên ku di nava NÇM'ê de ne, ji aliyê dewletê ve radana NÇM'ya İzmîrê û her cure pest û êrîşên li hemberî saziyên çandî bi daxuyanî, meş û stranan protesto kirin. Di nav van çalakiyên protestoyê de, ya herî balkêş meş û stranên zarokên koma Gulên Mezra Botan bû.

Stenbol: Meydana Azadiyê (Özgürlük Meydanı)

Beriya ku wê daxuyaniya çapemeniyê were xwendin polîsan dora meydanê girt û nehiştin ku protestovan bikevin meydanê. Li ser vê yekê protestoya Meydana Azadiyê li nêzîkî meydanê bi beşdariya rayedar, hunermend, koroya zarokan û yekîtiya malbatên NCM'ê, Grup Kızılırmak, Kutup Yıldızı û gelek hunermendên din li dar ket. Beşdaran di xwepêşdanê de sloganên wekî,"NÇM ya me ye, wê wisa bimîne, Pêkûtî me natirsînin û Hunera têkoşer bêdeng namîne" avêtin.

Stenbol: Beyoğlu

Zarokên Koma Gulen Mezrabotan li Beyoğluyê, girtina şaxê NÇM'a İzmirê protesto kirin. Zarokan li Pirtûkxaneya Mephîsto dema rojnamevan Savaş Ay pirtûka xwe ya bi navê "Şahîdên Çavdêr" (Göz Tanığı) îmze dikir ziyaret kirin. Di ziyaretê de zarokan ji Ay re qala cerd û pêkûtiyên li ser NÇM'ê kirin û jê li dijî pestan piştgirî xwestin. Ay, ji zarokan re soz da ku wê di destpêka programa xwe de li ser xebatên wan programekê çêbike.

İzmir

Li İzmirê jî ji bo protestoyê, Koma Azad li avahiya HADEP'a Konakê konserek da û girtina beşa NÇM'a İzmirê protesto kir.

Navenda Nûçeyan



Dijminên zatê mirov

Hejmara kovara Nûbiharê ya meha avrêlê (no:31 nîsan) derket. Nivîsa kovarê û manşeta wê ya vê hejmarê, "Dijminên zatê mirov"e. Di vê nivîsê de li ser du hêlên fikran (îdeolojiyan) tê sekinîn; fikriyat (teorî) û tetbîqat (pratîk). Di nivîsê de tê gotin ku hin fikr, bi xwe re azadî û pêşveçûnê tînin, lê di tetbîqatê de dikare bibe dijminê agahî, azadî û afirandinê.

Di vê hejmarê de dîsa gelek nivîs û helbest hene. Tiştê ku bala mirov dikişîne ser xwe, kurtbûna nivîsan e. Wergera Mesnewiya Mewlana û şiîrên Baba Tahirê Uryan ku ji aliyê Sabah Kara ve tê çêkirin, dîsa cih digirin. Navê hin nivîsên din ev in:

"Gazî li tirkan: Werin ser heqiyê (Şükrü Eslan), Heq û hiqûqê kurdan (Abdullah Amed), Nalînên birîneke kevnenû (Miradxwaz), Çend mulaheze li ser bêjeya "xwezayî"yê (Ali Karadeniz), Mem û Zîn li çi demê jiya bûn (Tehsîn İbrahîm Doskî), Peyamê Qur'anê: Sûreta İxlasê (Xurşîd Rûşen)."

Serwîsa Çandê

Nûdema havînê derket

Hejmara 14 a kovara hunerî, edebî û çandî Nûdemê derket. Nûdem, ji sê mehan carekê derdikeve. Di vê hejmarê de hin nivîsên balkêş hene.

Nivîsek Zeynelabidîn Zinar, li ser Mele Seîdê Kurdî (Seîdî Nursî) heye. Ji xeynî wê hevpeyvînek Firat Cewerî ya bi Vedat Türkali re, nivîseke Heyderê Omer li ser Evîna Cizîrî û Cegerxwîn, yeke Şerefxan Cizîrî li ser Descartes, nivîseke Mihemed Dehsiwar li ser jiyana Mahatma Gandî, yeke Hafiz Qazî li ser Hozan û Mueyid Teyib, nivîseke Mayakovskî li ser çawanivîsa helbestê ku ji aliyê Süleyman Demir ve hatiye wergerandin û yeke Zehra İpşiroğlu li ser pirtûka Samuel Beckett a bi navê Li Benda Godot ku ji aliyê Şefik Kaya ve hatiye wergerandin, hene.

Di vê hejmarê de li gel helbestan, çîrok jî hene. Mustafa Aydoğan bi çîroka Pînikêr, Edip Polat bi Derpiyê Sor û Ala Tirk û Ş. Bekirê Soreklî jî bi Mamoste Bêreng beşdar bûne.

Serwîsa Çandê



Şanoyê mi



Şonekê aşmê gulanî di ez ameya verî çemêki; aw dabi pero bêveng şîni. Serî yê di mijeko gewr giridiyabi bêrengan mendê keskesoreki. Ez lingan ser vindeta û mi wi wend; wi tundi bi û tebeqanî qalindana amibi peyda kerdiş. Heta hin qalind bi ku kişta ku merdim te di bi nêşkeni kişta bîn bibîno. Tebeqê aw qeydi vindetî bî ku nê vengek ça vejiyeni nê zî xuşîk ca ameni. Mi cê xwi di va heyran ma giraniyê no mijî ku zê perdek amo serî aw çendêk a. Pestî hewê şonî zî xwi hedî hedî mojnenira. Mi di lingî eravêr eştî û ez aniyawa dormalê xwi ra; çîçekanî bexçê kiştê mi dest pê kerdibi xwi roşnayi dinya rê cênipyero. Yin aw qeydi lem eştibi pî, verard şîbî yobîn ra zego ku dûrî ra evîndarî hezar seran newi resebî pî. Rengî yin wo kesk, spî, sor, belek, zer senî dormalê xwi otîr xemelnabi ez arda coşîn; mi puvet ku qelb bi rindiyê yin erzeno. Ez biya çot û mi hêdî dest eşt gulêk û bi gîştanî xwi vilna; sehî gîştanî mi bi mi da zanayiş ku zerikanî helê şanî newi yi terk kerdibî. Germiyê rojî bi serdiniyeka nerm re ca bedelnabi. Mi pirnikê xwi hetî yin ra berd û yo bi yo bi şahiyek bûy (bîhn) kerdî. Bûyêka nerm û tezî qulanî pirnikî mi ra şî cor û tameko şîrin ê wisarî da mi.

Mi sari eşti xwi ver bi hîseko şa verî verî aw avar şiya. Ez tena biya û mi no tenabiyayişî xwi ra zaf hez zî kerd. Cey û zemaneko bêpenî di bi xwi dir, bi hawirdorî xwi dir, bi dîmenî xwezê û kultur dir ri bi ri mayiş kêf bi xwi bi û mi in kêf heta mi desta ameni ardê ca. Nişka ra ez dest bi fîtekcenayiş kena. Cenayiş mi di derd, keser û kêf tyedir lem erzenî yobîn zê ê çîçekan ku inê ra lehzêki verî ez bi çimanî xwi biya şahid û jînî yin dî. Xetanî fîtikcenayiş mi di melodiyeko muzîkî bibi ku mi waşt ez ca vatan vejî heger wexteko bîni bê. Gelo vateye ku fîtekceyaniş mi di zê vengî bî çi bî? Ez bawerkena mi waştê vajî: "Derdo derdo ax derdo! Ti kul û kederî kerdî mi zeri wo... heta çi wext ez û ti ma bivermo."

Çaxa ku ez bi xwi awqiliyawa mi dî ku serî tiyelanî mejî mi di rewşeko newi peyda bû; ez barkena şina dinyê xwi ya zerî û wi cey di zeman û cey de liviyena; gerdûnêka bêpênî û te di ez gernas. Itiya di ez raştî geremboleyeko qirasi yena ku bi hezaran elementanî geometrîk ra amewo tewkerdiş û her yo element zerê no geremboley di serî xaleka şinasnayi di ca dawo xwi ku gurî xwi bero sari û bireso armancî xwi. Lehzek barciyan ez bena şahidî sazkerdişêko dramatîk ku no sazkerdiş di her çî yobîn dir dibendî di wo, lêbelê ina dibendî eynî wext di binatê peranî dijraberan di yo hemjînek peydakena ku na geremboli di jiyan lîstikê xwi berdewam keno.

Veng û bîhn. Nizdî ra giyanî mi xwi binatê veng û bîhnê şano wo sazkirî di vîneno. Ew mi rî zê hadîseyeko dîrokî ku ez ti wext raşt ci niyamîbiya yeno û ez bi kêf kuena miyan û hes kena ku ez parçeyekê no hemû ya; her çî bi bi dor dest keno pê: Ser di parçeyî horî ê xorî ê şenikî wazenî xwi rojî re bixelesnî, hina liviyenî ku eman dest di çiniya, yina ciyer ref bi ref mîrçikî sorbelekî bi qelb wîçwîçnenî wexta ku hetî rojava ra firdanî. Wîçwîçnayişî yin xwi verdeno ra kueno miyanî wendişî keşûşkan ku serî şaxanî daranî mazeyeran di bi wendiş lemçikêka xwi erzenî lemçikeko bîn ser. Vengî atmosferêka hevalî ku binatê celeb bi celeb mîrçikan di viraziyo yeno mi goşî û ez hetî xwi ra hadire ya ku bi kêf miyanî no atmosfera hevalî û şîrin di cey xwi bigerî. Nişka ra ciyer di tam serî erdî re bîhnêka tezî û bi ber bena berz û hemû ceyo veng kena pir, kuena zerê kezebanî mi û ana coşî. Ez cey xwi di bi çosîka ku merdiman xwira bena inê tam kena; bîhn tûj a û ê temiyanbiyayişî celeb bi celeb çeri, vilik, pel û dar û herê wisarî ya.

Şanoyêko mikemel, axînena ez û xwi rî spas kena ku ez no lehza elementanî sazgeho musîkalî ra yo wa.

MEMO DARRÊZ

Konferansa li ser toreya kurdî li Stockholmê li dar ket:

'Divêt em armanca Ehmedê Xanî baş bizanibin'

Di vê heftiya rabûrî (17–18.5.1995) de bi amadebûna Serokê PKD'ê Yaşar Kaya û li bin çavdêriya Endamê Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt û Endamê Rêvebiriyê yê ji Çandeya Kurdî Maşallah Öztürk û bi beşdariya nêzîkî 60 lêgerîner û torvanî, digel gelek guhdarên ku ji seranserî Kurdistanê bûn "Konferansa li ser toreya kurdî" hate lidarxistin.

Piştî rawestana deqiqeyekê li ser piyan ji bo giramgiriya şehîdan, bi vê axaftina Maşallah Öztürk konferansê dest pê kir:

"Di ser hemû tiştî re gelê kurd, bingeha xwe ya çandeyî û zimanê xwe parastiye. Gelê kurd, li dijî siyaseta qirkirin û nehêlanê, ji bo man û jindariya xwe, bi tekoşîna xwe ya bêrawestan û bênavebir, pêvajoya vejîna xwe pêk aniye û dest bi pêvajoya xwe ya rizgariyê kiriye. Ev vejîn her wisa di warê çande û ziman de jî cihê xwe dadigire.

Li pêş vê ronahiyê, divêt em armanca Ehmedê Xanî çak bizanibin. Ew berevanê yekgirtina me ya neteweyî bû. Nîgaşên wî (yên berî 300 salî) îro bi cih dibin. Xebat me ya ji bo demokrasî û yekgirtina neteweyî, bi bîranîn û armanca Ehmedê Xanî ve girêdayî ye."

Piştî vê axaftinê Serokê Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welat Yaşar Kaya ji bo pîrozkirina konferansê, daxwaza serkeftinê ji bo hemû beşdaran kir.

Di roja pêşîn ya konferansê de di bin sernavê "Di torevaniyê de teorî", "Rexne û metodên rexneyî" û "Di zimanê kurdî de torvaniya zarokan" de, du semîner hatin li dar xistin.

Di duwemîn roja konferansê de jî di bin sernavê "Di torevaniya kurdî de helbest; di torevaniya kurdî de çîrok; di torevaniya kurdî de raman" sê semîner hatin li dar xistin.

Piştî danasîn û pêşkêşkirina huner û hunermendiya ji deverên seranserî Kurdistanê, li ser lawazî û kêmasiyên di warê çandê û toreya kurdî de, bi hûrbînî hate rawestîn û ji layê guhdaran ve rexne, nêrîn û pêşniyar hatin pêşkêşkirin.

Semînera bi navê "Di toreya kurdî de helbest", bi beşdariya Mahfûz Mayî, Evdirahman Durre, Xebat Arif, M. Emin Penciwînî û Ekrem Xanosî, di dimhijmêr 09.00 rojê de dest pê kir. Kesên beşdar, her yekî helbestên xwe û yên deverên xwe dane nasîn û di der barê helbestên xwe û yên deverên xwe de pêzanin pêşkêşî guhdaran kirin. Lêger û nivîskar Malmîsanij, di pişka gengeşiyê de, li ser vî şêweyê axaftinê bi zimanekî rexneyî peyivî û bi vî rengî nêrîna xwe anî ziman: "Li şûna ku li ser helbesta kurdî bipeyivin, tenê helbestên xwe dixwînin û wan şîrove dikin. Dernexistina şemayeka (portre) giştî, ya li ser helbestên kurdî, kêmasiyeke mezin e" got. Her wiha, li hemberî vî şêweyê axaftdarên seminerê guhdaran ji bêdiliya xwe diyar kirin.

Di duyemîn semînera rojê de bi navê "Di toreya kurdî de çîrok" Ferhad Şakelî, Firat Cewerî û Hesenê Metê beşdar bûn. Di duyemîna roja konferansê de semînera dawî jî "Di torevaniya kurdî de roman bû." Ji ber nexweşiyê nehatina Îbrahîm Ehmed û ji egera nestandina vizeyê, nehatina Selîm Berekat bû sedem ku axaftinbêjê semînerê tenê Nacî Kutlay be. Di beşê gengeşiyê de du kêmasiyên bingehîn di romana kurdî de hatin destnîşankirin. 1– Nebûna fanteziyê 2. Çavlêkirin û veguhestin.

Her wisa bi bangewaziya Maşallah Öztürk ji bo kombûna hemû rewşenbîrên kurd li bin sitara YRWK'ê dawî li konferansê hat.

Serpêhatiya zarokekî ku gundê wî li pişta Çiyayê Gabarê ye

Hindik ma, ezê jî werim cem we



Gundê Rodî li hêla Botan li pişta çiyayên Gabarê ye. Hingê ku bavê wî çûye şerê azadiyê, ew bi qasî mirovekî mezin kar û bar dike. Ji xwişk û birayê xwe yê biçûk re bûye wekî bav. Werzên havînê li dû palan tapol dike, giha dikişîne ser lodan. Dema genim li patozê dixin kayê dikişîne kadînê. Dewaran sibehan dibe naxirê. Êvaran tîne dike tewle û alifên wan didê. Ji xeynî van karan alîkariya diya xwe jî dike. Niha hûnê bêjin: "Gelo Rodî di nava ewqas kar de aciz nabe û ew zarok e û daxwaza wî tune ku ew jî, bi zarokên din re bileyize." Belê zarokino Rodî jî carinan diçe li xopana gund bi zarokan re dileyize. Lê hingê ku şerê azadiyê dest pê kiriye, lîstikên zarokan ji şikl û bingehên xwe guherine. Pirî caran lîstikên wan temsîliya şerê di navbera gerîla û leşkerên hov de ye, an jî li ser rewşa şer diaxivin.

Diya Rodî pir bi ber wî dikeve ku ew neçûye dibistanê û xwendinê nizane. Daxwaza dayikê ew e ku wî bişîne Stenbolê cem xalê wî ji bo ku û li wir here dibistanê, xwendin û nivîsandinê hîn bibe. Rodî jî qerar daye ku here cem bavê xwe û çek hilde. Dayik ne li dijî wê fikrê ye, lê ew dibêje: "Tu hê biçûk î, heya panzdeh, şazdeh salî bixwîne, ji wê şûn ve ezê te bi dîlan û çepikan bişînim çiyê." Rodî dîsa jî naxwaze here, dibêje: "Dema ez bêriya welatê xwe bikim ew der pir dûr e, ezê çawa werim." Dema bavê Rodî çû şerê azadiyê ew şeş salî bû. Rodî wê rojê tu car ji bîr nake, her roj wê demê tîne ber çavên xwe û soza ku daye bavê xwe tê bîra wî: "Ez dema mezin bibim; tu şehîd bikevî, nekevî ezê werim cem te." Bavê wî wê demê serê wî mizda û bi dilekî şewat, lê bêxem wisa got: "Kurê min ji bîr neke heya ku welatê me azad nebe, em nagihîjin xweşî, rindî û serfiraziyê." Rodî biçûk bû, lê ji denggermiya bavê xwe û ji awirên çavên wî dizanibû ku ev tiştê ku dibêje pir girîng e. Bavê wî jê re got: "Dema te bêriya min kir, derkeve cihekî bilind û deng li min bike ezê te bibihîsim." Ji wê rojê şûn ve dema bêriya bavê xwe dikir, diçû serê gund û bang dikir: "Bavo min bêriya te kiriye, serkeftinê ji te û hemû rêhevalên te re dixwazim. Hindik ma ezê jî werim cem we." Hemû gundiyan pê zanibû ku ev dengê Rodî ye û wî bêriya bavê xwe kiriye. Di gund de gelek dê û bavên gerîlayan hebûn, yekcaran bi henekî digotin: "Rodiyo silavên me jî bêje ji hevalan re." Rodî heya du–sê salan bi rastî jî bawer dikir ku bavê wî dengê wî dibihîse û dibû wekîlê silavên gundiyan û silavên wan jî digotin. Gundî carcaran dikeniyan, carcaran jî şewatek diket nava dilê wan, hêstirên çavê xwe ji hev vedişartin.

Neyarê hov jî zanibû ji wî gundî gelek kes derketine çiyê, ji wê yekê bû ku her carê ku êrîşî gund dikirin û ecir dikirin bi gundiyan, jin, mêr, kal û pîran tazî rût dikirin li hola gund, lê didan û dest diavêtin jinan, heya zarok jî didan ber jop û pehînan. Daxwaza neyarê hov ew bû ku gundî bibin cehş û alîkariya hevalan nekin. Lê gundî hemû welatparêz bûn û bi mirinê qayil bûn, lê cehşîtî tu carî qebûl nekirin.

Rojekê dîsa leşkerên hov hatin gund, hemû gundî kom kirin û daxwazên xwe gotin. Serleşkerê wan wekî har bûbû, kef bi devan ketibû. Jin û mêr ji hev qudandin û jin birin dibistana gund. Dibistan jî sê sal berê ji aliyê hevalan ve hatibû şewitandin û ji wî şûn ve mamosteyê tirk ji tirsan nehatin gund. Mêran li ber xwe dan û nedixwestin ku jinan bibin bikin dibistanê.

Leşkerên tirk, dixwestin ku dest bavêjin jinan, mêran êrîş kirin ser leşkeran, leşker şûn ve çûn lê gule avêtin û du gundî hatin kuştin. Rodî reviya çû cem diya xwe, serleşker dît ku Rodî çû cem diya xwe, bang kir: "Were vir kurê kerê", Rodî ji ber vê pirsê pir hêrs bû. Di dilê xwe de got xwezî niha heval û bavê min bihatana û ev leşkerên bênamûs bikuştana. Serleşkerê hov dît ku Rodî nayê, hê bêhtir qîriya: "Di..... dayika te zû were, tu jî wek bavê xwe terorîst î" û du leşker şandin ku Rodî û diya wî bînin. Leşker dema çûn ser diya Rodî, Rodî jî di cih de bazda û êrîşên leşkeran kir. Leşker ew û diya wî dan ber pehîn û dîpçikan.

Demekî şûn ve Rodî çavên xwe vekirin, pir şa bû ku diya wî mizgînî dayê: "Berxa min hevalan êrîşî ser leşkeran kirin û bavê te jî di nava wan de bû." Rodî hemû êşa xwe ji bîr kir, "çima te gazî min nekir? Çima bavê min nehat cem min?" û hê diaxivî ku apê Qaso got: "Kurê min tu nabihîsî hê dengê tanq û topan tê, hevalan koka leşkerên Romê anî." Rodî xwest ku rabe ser xwe, lê her derê wî diêşiya. Leşkerên hov dema ji gund derdikevin şervanên azadiyê wan dixin kemînê û lêdidin. Xwesteka Rodî tê cih, lê nikare rabe ser xwe, ev wî pir diêşîne.

Heftiyek şûn ve bavê Rodî bi şev tevî du hevalan hat mal. Rodî xweş bûbû, lê hê jî lingê wî ya çepê diêşiya. Ji çar salan şûn ve gihîştibû bavê xwe ji şabûnê nizanibû ku çi bike. Wê şevê soz da bavê xwe ku ewê here cem xalê xwe û heya dibistana navîn bixwîne û ji wê şûn ve bibe şervan.

Belê zarokino, çîroka Rodî wisa dest pê kir, em binêrin ewê çawa bidome. Heftiya din Rodiyê rewi ye û ewê here Stenbolê. Heya wê gavê bimînin di xweşiyê de.

ROTÎNDA YETKÎNER

N A M E Y Ê N X W E N D E V A N A N

Çend pêşniyar ji Welatê Me re

Birêz hevalên hêja! Çend rexneyên min li we hene. Lê rexneyên tûj nîn in. Wekî hêvî an jî wekî pêşniyazan bihesibînin. Yek; ji bo çi hûn helbestên kurdî naweşînin? Mînak hûn dikarin beşa falê rakin û li cihê wê helbestên kurdî binivîsînin. Ji bîr nekin muzîk jî beşekî çanda kurdî ye. Lê fal tiştekî zehf pêwist nîn e. Hûn cih bidin helbestên dîrokî û nûjen, wê gelek baş bibe. Ez bawer im ku gelek xwendevan jî di vê baweriye de ne. Du; zimanê xwe hêsan bikin. Ji bîr nekin ku heta niha zimanekî standard tunebû. Gava em dixwazin yekî/ê hînî xwendinê bikin, pirsa wan a yekem, dibêjin: "Ziman giran e, di xwendinê de dijwarî tune ye. Lê peyvên nû gelek in." Sê weşanên bi kurdî hemû, bi giranî guftûgoyên li ser zimên û nivîsandinê dikin. We em kuştin, ma hûn nikarin li hev rûnên û di nav xwe de peymanekê çêkin û biryaran bistînin. Hûn çi biryarê bistînin emê bipejirînin. Çimkî em birçiyê zimanê xwe ne. Ez di jiyana weşana TV–MED'ê de jê re serkeftinê dixwazim.

Remzî Golxanlı/ Ruha

Yekkirina zimanê kurdî

Di bin tîna tava roja şoreşê de, ji we re dibêjim roja we baş ronahî û bi tîn be.

Pêşî ez we bi hezkirineke gur û gewz hembêz dikim.. Bi ceweta van rojan dixwazim çend daxwazên berbiçav pêşkêşî nihêrînên we bikim.

Êdî li ser yekkirina zimanê kurdî, gotûbêj û rûniştin tên çekirin. Lê hema çend xebatên bingehin, nepenî dimînin. Divê were zanîn ku, çawa bi parçekirina welat, ziman jî zaravayan parçe bûyê, her wiha her zaravayek jî li devokên herêmî belav bûye. Di zazakî de herêma Dêrsim û şeqê Xarput, Çewlikan, baş ji hev fêm nakin. Her wiha di zaravayê kurmancî de, herêmên Botanî, Serhedî, Xerzî, Amedî, Torî û rexê bajarên Semsûrê, Mereşê, Dilûkê bi devokên cur bi cur diaxivin. Nexwe divê pêşî ev devok nêzî hev bibin. Ev jî bi tv'yên pak dibe. Ji her herêmê û her şiklê axaftinê were hilbijartin û di gotûbejan de, bi devokê xwe biaxivin û li hev guhdarî bikin û gel jî, li wan guhdarî bike, wê gelek baş be. Bi hêviya bi cihanîna xebatên li benda me mayî...

Bekirhan Yıldız/ Amed

Faîl–î meçhûl ne meçhûl e

Têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistanê di eniya dîplomasiyê de roj bi roj bi gavên mezin pêş ve diçe û rêxistinên neteweyî ava dike, ber bi dewletbûnê ve diçe, têkoşîna kurdan bi dinyayê didin naskirin. Ji ber ku komara tirk bi lîstik û taktîkên nû bi ser gelê kurd ve diçe, rûyê xwe yê qirêj û gemarî dertîne holê. Heta vêga yeko yeko bi navê "faîlî–meçhûl, kurd qir dikirin digotin: "Hîzbullah wisa dike." Vêga li gundan digere nabîne ku bi şewitîne, berê xwe daye bajarên kurdan. Qirkirinê dike, cihê ku gel zehf in, bombeyan dixê, li wan cihan qetlîaman dike û dibêje: "PKK wisa dike." Gel vî fîlmî ev 10 sal e temaşe dike lê gel dizane kî van livbaziyan dike.

Yek ji van mînakan; heftiya borî li Êlihê û li Îdirê bû. Komara tirk bi televîzyon û hemû rojnameyên xwe ve bi devekî gotin PKK ye. Êdî dinya alem tev dizane bi fen û lîstikên komara tirk, ew çi bêje kes jê bawer nake faîl ne meçhûl in, faîl kontrgerîla ya tirk e.

Gelek silavên şoreşgerî li we bin. Di karê xwe de her dem serfiraz bin.

Avdile Tewfiq



JI WELATÊ ME

MAZHAR GÜNBAT

Rojnamegeriya kurdî ya doh

Rojnamegeriya kurdî beriya nêzîkî 90 salî dest pê kiriye. Di 90 salan de li ser rûyê cîhanê gelek tişt guherîn. Di vê pêvajoyê de bi dehan împartorî û saltenat hilweşiyan, sînorên welatan guherîn, bi sedan netewe û civakan dewletên nû ava kirin, di her warî de şoreş, reform û keşfên zanistî û teknolojîk pêk hatin, sîstemên civakî û awayê jiyanê li piraniya cihanê guherîn...

Bêguman, di pêkhatin û rûdana van guherinan de li nik gelek sebebên din, tesîr û rola rojnamegeriyê jî çêbûye. Li aliyê din pêşveçûn û guherinên di 90 salên dawî de bûne sedem ku rojnamegerî ji biguhere û li gorî mercên nû, xwe nûjen bike. Dema li rojnameyên destpêka vê pêvajoyê û li yên îro tê nihêrtin, tê dîtin ku di teknîk, metod û gelek beşên rojnamegeriyê de gavên pir mezin hatine avêtin Helbet ev yek êdî zehf ji bo welat û civakên pêşveçûyî, dikare bête gotin. Gelo ji bo rojnamegeriya kurdî jî mirov dikare behsa peşveçûneke berbiçav bike? Bi qasî ku tê xuyakirin, lipaşmayina civaka kurd nehiştiye ku rojnamegeriya wê jî bi pêş bikeve.

Tevî vê yekê di pêvajoya 90 salî de, temenkurt jî bin bi sedan rojname, kovar û weşanên kurdî yên periyodik derketin. Em dixwazin ku ji vê heftiyê bi şûn ve nivîsekê ji rojname û kovarên ku berê derketine, bineqînin û di Welatê Me de biweşînin. Bi vî awayî wê Welatê Me bi mînakan rojnamegeriya kurdî ya berê bide nasîn.

Gelo zimanê rojnameyên ku berê derdiketin çawa bû, li ser çi dinivîsandin, kê dinivîsand, aliyê wan ê rojnamegeriyê çiqas xurt bû, çi tengasî û kêmasiyên wan hebûn, çi ferq di navbera rojnamegeriya hingê û ya îro de hene? Em bawer in, bi vê yekê, wê xwendevanên me li ser rewş û naveroka rojnamegeriya kurdî bibin xwedî zanîn û wê jê îstîfade bikin.

Wek destpêk, ezê nivîseke Celadet Bedîrxan a ku di hejmara 23. a paşgoya Hawar, Ronahiyê de, di adara 1944'an de hatiye weşandin, di vî quncikî de pêşkêşî xwendevanan bikim. Nivîsa wî li ser rewş û zimanê rojnamegeriyê bû û bi sernavê "Bo agahdarî" derketibû. Nivîs ev e:

"Me ji kovara Gulavêjê gelek minet e ko kovar û rojnameyên me di nav kurdên Iraqê de propegende kirine û bi vî awayî şanî hevdûgirtineke nijadîn daye. bi tenê di agahdariya Gulavêjê de gotinek heye ko emê li ser wê hinekî bisekinin.

Belê Gulavêjê gotiye: "Bi zimanî kurdî Botan". Gelo ji gotina "kurdiya Botan" mexsed çi ye? bê şik mexsed kurdiya ko di cihê Botan de pê tête axaftin e.

Ji miletê me re "kurd" dibêjin û wek her miletî ew jî bi zimanekî xweser, daxêve û ji wî zimanî re jî "kurdî" dibêjin. Çi milet çi ziman her du jî arî ne. Herçî ziman di nav zimanên arî de ji şaxa îranî, ji birê hindo ewropayî ye.

Dîsan di zimanê me kurdiyê de her wekî di gelek zimanên pêşveketî de têtе dîtin; zarin hene. Yanî zimanê me di bin tesîra gelek hêmanan (insir) de bi zaran lêk ve bûye. Ew zar jî di bingehî de sisê ne: Zarê bakur, zarê nîvro û zarê dimilî. Herçî zarê bakur jê re kurdmancî dibêjin. Yên ko bi dimilî taxêvin ewçend têkilî kurdên kurdmancî-ziman in ko ji wan re sênc û tixûb danîn dişwar e. Herçî zarê nîvro zimanê kurdên welatjêrî ye. Heye ko lorî û hewremanî jî li gora bastûra (binye) xwe bikevin nav vî zarî. Welatjorî ji vî zarî re û bi tevayî zimanê soran dibêjin.

Em bên ser gotina "Kurdiya Botan". Botan wek soran, Şêrwan, Behdînan welatekî Kurdistanê ye û ew der li wextê berê mîrîtiyek bû; mîrekî lê hikim dikir. Di vî welatî de ji bîstan bêtir eşîr dijîn û ji wan eşîran re eşîrên Botan dibêjin. Cihê Botan di welatê jorîn de ye û ji lewre xelkê wî bi zarê bakur yanî bi kurdmancî taxêvin.

Herçî zar, ew jî bi zaravan li hev vedibin. Ji zaravan re tixûb nîne. Carina ew ne ji bajarekî lê ji gundekî heta bi gundekî din ferqina şanî didin.

Şam, Heleb, Bêrût sê bajarên Sûriyê ne û di wan her sê bajaran de jî bi erebî bi erebîke ko em jê re sûrî bibêjin xeber didin. Gava sê peya, şamiyek, helebiyek û bêrûtiyek bi darî hev dikevin û dipeyivin mirov tavil dizane ko yek î Şamî ye, ê din Helebî ye û ê siseyan Bêrûtî ye. Ji ber ko heryekî zaravekî xweser heye û hin dengan weke hev bi lêv nakin.

Piştî vê ravekê (îzah) em cardî ji xwe bipirsin ma "Kurdiya Botan" çi ye? Zimanê xelkê Botan kurdî ye, zarê wan kurdmancî ye û wan zaravakî xweser heye. Ji lewre botî di nav kurdine din de ji zimanê xwe kifş dibin ko botî ne.

Herçî zimanê kovar û rojnameyên Sûriyê: Ev kovar û rojname bi zarî kurdmancî têne nivîsandin û nivîsevanên wan dixebitin ko zimanekî yekbûyî bînin pê. Ji lewre guh nadin zaraveyên xwe û ji ber vajî ve wî bi şûn de dihîlin û berê xwe didin zimanekî ayendê î gelemper (imûmî) û di vê xebatê de ji pirsên zarine din jî dixwazin fêdemend bibin.

Botîtiya van kovar û rojnaman di xwediyên wan de yê.

Belê xwediyên wan kovar û rojnaman bi xwe botî ne. Lê ew jî di nivîsarên xwe de zaravayê xwe tucaran eşkere nakin. Eşkere bikirina diviya bû li şûna (rabû û çêbû) (rabî û çêbî) binivîsandana. Em gelek spasan ji kovara me a hêja û giram re dikin ko ew rê xistiye ber me û bi vê hêncetê me çêl li zar û zimanê kovar û rojnameyên xwe kir.

FERHENGOK

Ayînî: Dînî, olî
Berebezî: Pêşbazî, musebeqe
Çavdêr: Muraqib (Gözlemci)
Çavdêrî: Mureqebe (Gözlem)
Dembuhêrk: Sohbet
Demhijmêr: Kathijmêr, saet
Destnîşan: Tesbît
Destnîşankirin: Tesbîtkirin
Dirişm: Slogan
Diyar: Xuya, li ber çav
Gelêrî: Folklorîk, malê gel
Gorepan: Qad, meydan
Hilbijarane: Bijarte
Helsengandin: Bicihkirin
Hinartin: Şandin
Hûrbîn: Kesê bidîqet
Hûrbînî: Bidîqetbûn
Kaval: Portre
Komel: Civak
Komelgeh: Dernek
Komal: Mala gel (Halkevi)
La: Al, teref
Layê: Aliyê
Lawaz: Zeîf, qels
Lawazî: Zeîfî, qelsî
Namîlke: Broşur
Pak: Tahir
Pêkanîn: Bicihkirin
Rabûrî: Dema çûyî
Rêveber: Kesê ku karekî bi rê ve dibe (yönetici)
Rêveberî: îdare (Yönetim)
Rijd: înad
Sazûman: Sazî, (Kurul-kurum)
Şêwe: Usûl
Şêwekarî: Kar û kiryariyên bi usûl
Taqîkirin: İmtîhan-imtîhankirin
Terxankirin: Cudakirina tiştekî bi taybetî ji bo tiştekî din.
(Welatê Me, rûpelek ji min re terxan kiriye)
Tore: Edebiyat, wêje
Xwecihî: Mehellî
Xweşnivîsîn: Xetatî

AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me Divê

	Li Hundir	Li Derve
☐ 3 Meh	☐ 550.000 TL	☐ 45 DM
☐ 6 Meh	☐ 1.000.000 TL	☐ 80 DM
☐ 12 Meh	☐ 1.800.000 TL	☐ 150 DM

Bedelê Abonetiyê ez radizînim

Li Tirkiyê – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264–1

Li Derve – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507–3

NAV Û PAŞNAV : .....
NAVNÎŞAN : .....
.....

Navnîşana Welatê Me
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
Tel–Fax: 293 53 19

WELATÊ ME
Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
Aynur BOZKURT
.....

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
Mazhar GÜNBAT
.....

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazışleri Müdürü)
Metin AKSOY
.....

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
Suut KILIÇ
.....

Redaktor
Sami TAN
.....

NAVNÎŞAN (Adres)
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL–FAX
293 53 19

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÛNERÎ
(Temsilcilikler)

Suriye– Jan Dost
Fener Rojbiyanî
Berlin– Silêman Sido
Sîrwan Reşîd
49-30-69 00 26 95
Hannover– Selîm Biçûk
49-5721-813 60
Hamburg– A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
Munchen– Mahmut Gergerli
49-871-670 884
Badenwurttenberg–
A. Rahîm Ayaz
49-75453258
Amsterdam– Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
Parîs– M.S. Ayçiçek
33-1-48000401
Atîna– Ferhan Zêbarî
30-13634905
Bruksel– Medenî Ferho
32-16-49 07 67

Li başûrê Kurdistanê heftiyê carekê bi kurdî û erebî tevî hemû şertên dijwar dengekî gur bilind dibe

Li Başûr dengekî cihêreng: Rojnameya Welat

Heftînameya Welat, bi gotarên xwe yên hemû-reng û bi belavkirina nûçeyên xwe yên germa-germa ku li seranserî Kurdistanê rû didin, wekî rojnameyeke Kurdistanî xwe daye herêkirin. Bi sergotar, pêşniyar, rexne û şîrovekirinên xwe ve destkariyê di hemû kar û barên Kurdistanî de dike û her wisa çareseriyê jî ji bo deverên berpirs pêşkêş dike.





Herdu bergên rojnameya Welat a ku li başûrê Kurdistanê derdikeve.

Di havîna 1993'yan de li Hewlêrê (Paytexta Dewleta Kurdî ya Federal) Welat dest bi weşana xwe kiriye û heta bi îro digel derxistina bêhtir ji 70 hêjmarî, berdewam e li ser weşana xwe.

Rojnameya Welat ji 12 rûpelên 34x47 pêk hatiye û ji heftiyê carekê bi du zaravên kurdî (soranî-behdînanî) 8 rûpel û 4 rûpel jî bi zimanê erebî der diçe.

Ev rojnameya ku ji heftiyê carekê bi tîpên erebî derdiçe, ji layê (aliyê) naveroka xwe ve gelekî bist û dewlemend e. Li rûpelê pêşî û yê dawî bi zimanê kurdî û erebî navê rojnameyê Welat hatiye nivîsîn û li ser navê rojnameyê nexşê siyasî û giştî yê Kurdistanê hatiye çêkirin û li bin navê rojnameyê jî "heftînameyeka siyasî, serbixwe ye" û li hemberî navê rojnameyê jî, "Welat Kurdistaneke Serbixwe û Azad" hatiye nivîsandin.

Heftînameya Welat, bi gotarên xwe yên hemû-reng û bi belavkirina nûçeyên xwe yên germa-germa ku li seranserî Kurdistanê rû didin, wekî rojnameyeke Kurdistanî xwe daye herêkirin. Bi sergotar, pêşniyar, rexne û şîrovekirinên xwe ve destkariyê di hemû kar û barên Kurdistanî de dike û her wisa çareseriyê jî ji bo deverên berpirs pêşkêş dike.

Nivîskarên heftînameya Welat yên berdewam ev in; Yê ku sergotorê dinivîsîne Serdar Resûl e. Li rûpelê duwemîn "Goşeya Azad" heye. Li rûpelê sêyemîn nivîskarê berdewam Serokê Giştî yê Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) Abdullah Öcalan dinivîsine. Rûpelê çaran, ji çalakî û rûdanên gerîlayan re hatiye terxankirin. Her wisa "nameyên xwendevanan" jî di vî rûpelî de cih digirin. Di rûpelê pêncan de jînenigariya gerîlayên şehîd û şîrovekirinên pisporan cih digirin.

Rûpelê şeşan, rûpelê pişeyî, çandeyî û toreyî ye. Rûpelê heftan, berdawama nûçe û rûdanan e, ji rûpelê yekemîn û ji nerînên pisporan pêk hatiye. Rûpelên heştan jî di bin navnîşana "Welatê xwe binase" de, ji bo danasîna bajêrên Kurdistanê ji layê cografî, komelayetî, mêjûyî û çandeyî ve hatiyê terxankirin.

Her çar rûpelên ku bi zimanê erebî ne jî bi vî rengî derdikevin.

Rûpelê yekemîn, bi rûdan û nûçe û bizavên siyasî yên PKK'ê û bi çalakiyên leşkerî yên gerîlayên ARGK'ê hatine xemilandin. Rûpelê duwemîn jî, dîsa bi şîroveyên siyasî yên pisporan hatiye dagirtin.

Her du rûpelên sêyemîn û çaremîn jî, ji bo tore û çalakiyên hunerî û pîşeyî hatine terxankirin.

Piştî vê danasinê me divêt em ji bo xwendavanên xwe bidin xuyakirin ku heftînameya "Welat" digel ku li Kurdistana azad derdikeve, lê dîsa jî, ji ber şepa çavnebar û dilnexwazan riha nebûye. Hêj di destpêka xwe de ji çavên hindek kesan nereviyaye û tûşî asteng û giriftariyan bûye. Ji hejmara xwe ya 13'an û pêve, li ser daxwaza hindek "taybetmendan", ji layê parezgerê Hewlêrê Evdil Muheymen Barzanî ve heftînemeya Welat hatiye desteserkirin. Piştî vê kiryara diltezîn ya parêzgerê Hewlêrê, heftînameya Welat, êdî dest bi weşana xwe ya nihênî (ilegal) dike. Rewşa Welat ya nihênî nêzîkî salekê didomîne. Digel damezrandina duwemîn hikûmeta Kurdî ya Federalî, careke dî bi aşkerayî dest bi weşana xwe dike. Di encam de, wekî rojnameya Welatê Me, ji dil û can em daxwaza serkeftin û pêşkeftina Welat dikin. Em sergotara vê heftînameyê ya hejmara 67'an bi zaravê botanî pêşkêşî xwendevanan dikin.

Sergotar

Dirêjkirina xola parlementoyê li dûv mercên Başûr û planên dagirkeran:

Roja 27.5.1995'an, parlamentoya başûrê Kurdistanê di rûniştineke ne-asayî, kombûna xwe ya yasayî de, bes ji bo salekê xol (devr)a xwe dirêj kiriye. Vê kombûna parlementoyê, di rewşeke wisa pir aloz û arîşeyên başûrê Kurdistanê û plangêriya welatên dormandor de ku bûye, diyar dibe ku hay ji xwe heye. Ev jî pêngavake di cihê xwe de ye, digel ku bendewariya gelek biryarên mezintir jî heye.

Bi rastî ev rûniştina parlamentoyê, diviyabû bi astekî bilintir yê berpirsan hatibûya kirin, da ku bar û doxên siyasî, aborî û komeleyetî yên başûrê welat li pêş çavan hatibûna raxistin. Her wisa di ser her tiştî re, bi hûrbînî li ser çarenîvîsa gelê me hatinbûna rawestandin û biryara yeklayen û bêveger hatibûya standin. Li ser vî bingehî bûyera agirbestê û dawîlêanîna şerê navxweyî ku bûye çavkaniya hemû êş û şermezariya gelê me, bi tevayî ji holê rakiribûna. Her wisa bi giyanekî berpirsiyarî, nîştîmanî û bi biryareke bi vî rengî, hest bi wan metirsiyên ku di riya gelê me de ye hatibûna kirin. Ji bo têkbirin û nehêlana wan planên dijminan ku dixwazin destkeftiyên başûrê welat bingor bikin, diviya tedbîra pêdivî hatibûya standin.

Belê, pêdivî bû ku parlemento (ya kurdî), bi kombûneke germ û ne-asayî ya bi vî rengî, li ser çarenivîsa gel û hikûmeta herêmê biryar bidana, ne ku hiştibûna bi hêviya rewşeke tarî û nediyar. Bi taybetî li vê dema ku her du dagirker (ên Kurdistanê) Iraq û Tirkiye, ji bo jinavbirina çarenivîs û deskeftiyên gelê me ku ji dil û can dixebitin, ji layê hemî kesî ve baş tête zanîn ku niyaza Tirkiyeyê li başûrê Kurdistanê çi ye û ji bo nehêlana hebûna giyanê kurdî ku çawa bizavê dike? Vêca, wan çavpêkeftinên ku ji bo pûçkirina berhemê xwîna şehîdan her du partiyên sereke (YNK-PDK) digel Tirkiyeyê çi watiniya xwe heye?!. Pêkanîna kembera parastinê li navbera başûr û bakur ku yek milet tê de dijî û xudan yek çarenivîsê ne, di berjewendiya kê de ye û çi digehêne kê?!. Baş e dagîrkerên tirk û iraqê dixwazin van destkeftiyên li Başûr ji nav bibin. Ev hemû cihê metirsiyê ne û diviya parlemento (ya kurdî) li ser vê çendê bipeyiviyana û li dûv biçûna...

DILDAR ŞEKO

www.grs.nl

elinewerek







